



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî
Miqdad Mîhed Bedirxan

Armanç

Hejmar, No: 154

Çiriya Paşîn
November 1994

Buha - Price
20 SKR, 4 DM

Rojnameya Mehane



Ber bi yekîtiyê ve

Di 20'ê Çiriya Paşîn de 5 partî û rêxistinên sosyalîst; YEKBÛN, KAWA, KUK, TSK û Têkoşîna Sosyalîst biryara yekîtiyê girtin û ji raya giştî re beyanek derxistin. Beyan wiha ye:

"Karê yekîtiya siyasî û rêxistinî ya sosyalîstên Kurdîstana bakur ya ku di du platformên çîhê de jê re xebat dihat kirin, gihîşt qonaxê nuh.

Guftûgoyên ku demek e di navbera du platformên ji KUK, TSK, YEKBÛN û KAWA, Têkoşîna Sosyalîst pêkhatî, bi biryara yekkirina her du platforman bi dawî hatin û di warê siyasî û pratîk de hin gavên girîng hatin avêtin.

Rêxistinên me di vê qonaxa

xebata yekîtiyê de erkên teorîk û pratîk yên ku wê sosyalîstan ber bi Kongreya Yekîtiyê ve bibe, dest nîşan kirin û biryar dan ku ev xebat di çarçewa teqewîmeke xuya de bi cih bê.


Wekî ku di beyana "TESBÎTÊN HEVBEŞ YÊN LI SER REWIŞT û AWAYÊN YEKÎTÎYA SIYASÎ û RÊXISTINÎ" de jî hatiye xuya kirin; rêxistinên me di warê naverok, awa û rêwiştê yekîtiyê de li hev kirine.

Lê xebata yekîtiyê wê di warê teorî û pratîkê de bi hev re bê meşandin. Ji bo kûrkirina pêvajoya pratîk a yekîtiyê, rêxistinên me di çarçeweya programekê de hem li welêt, hem jî li derveyî welêt karên hevbeş dane pêşîya

xwe. Bi vê armançê li gor rewş û hoyên îro di warên pêwîst de biryara hin gavên rêxistinî jî hatiye girtin.

Platforma yekîtiya sosyalîstan ya ji KAWA, KUK, TS, TSK, YEKBÛNê pêkhatî ji hemû kadro û aliyên sosyalîst re vekirîye. Lewra platforma me gazî kadro û aliyên sosyalîst û şoreşger dike ku aktîf beşdarî vê xebatê bibin. Platforma me wê di vî warî de jî xwedî însiyatîf be û erk û berpirsiyariyên xwe bi cih bîne".

Ev partî û rêxistinên ku biryara yekîtiyê girtin di paratîkê de gava xwe ya pêşîn di 26' Çiriya Paşîn de avêtin, li Stockholmê bi hev re şeveke şahiyê çêkirin.



Abûqatê niştimanperwer û yekî ji daweya "49" an

Medet Serhat hat kuştin

◆ Dr. Naci Kutlay

Hevalê min î hêja Medet Serhat di 11'ê Çiriya Paşîn de li Stenbolê hat kuştin. Dema ji Armançê tîka kirin ku ez nivîsek li ser jiyana wî binivîsim, min bê şik got, "belê". Lê belê wexta ku min xwest dest bi nivîsarê bikim, ez têgihîştim ku ev kar ne hêsa ye.

Meriv bifikire ku Medet miriye û li ser wî binivîse, hûn werin vî zahmetiyê nuha ji min bipirsin.

Medet 1934'an de hatiye dine. Kurê Îsa axa ye. Bawê wî

li derûdora Ixdirê bi nav û deng bû. Mal û konê wî her tim ji hemû kesan re vekirî bû. Di nav eşîra xwe û yên din de gelek bi rûmet û giranbûha bû. Yekî welatparêz bû. Dibistan û xwendin ji bo wî pir girîng bû. Lewra wî kurê xwe, Medet da xwendinê. Wê çaxê li gundê wan li "Alî Can"ê dibistan tunebû. Bavê Medet Îsa axa zû mir, Medet hîn zarok bû. Diya Medet yeka pir bi qedr û qîmet bû û li zarokên xwe bû xweyî. Min Îsa axa nedît lê diya Medet dît, ew çend sal berê mir. Hinek

Dûmahîk: r.11

Peyvên şêrîn rastiya GAP'ê venaşêrin

Di 9'ê Çiriya Paşîn a 1994'an de bi beşdariya Serokkomar Sulayman Demirel, Serokwezîr Tansu Çiller, hin wezîr û nêzî 500 mêvanên biyanî û bi debdebeyeke mezin yek ji tunelên Ruhayê ya di nav projeya "GAP" (Projeya Anadoluya Başûrêrojilat) de hat vekirin. Li gor gotinan bi tenê ji bo şahiya vekirina tunelê 20 milyar lire hatiye veqetandin. Tunelên Ruhayê û "Bendava Atatürk" ya ku berî nuha hatibû vekirin, du proje ne ji dehan projeyên di nav çarçewa PAB'ê de.

Li gor înfomasyonê dezgehên resmî yên Tirkî, PAB projeyê entegre ye û bi armanca avdan û enerjîyê li ser çemê Firatê 7, li ser çemê Dicle jî ji 6 projeyan pêk tê; li ser Firat û Dicle 22 bendav, 17 sentralên hidroelektrîk wê bîna avê kirin. Li gor rêqemên tîndayî, piştî avakirinê, wê 1.6-1.7 milyon hektar zevî bîna av dan û 26-27 milyar klv.saet elektrîk bê bi dest xistin.

Lê hinek rastiyên vê projeyê hene ku giregirên Tirk bi zanîna ji raya giştî vedişêrin, yan bincil dikin. Li deverên ku ev proje dikevin ber, Samsûr, Mersin, Meletya, Entab, Ruha, Diyarbekir, Mêrdîn, Sêrt, Batman newekheviyêke pir mezin di warê xwedibûna erdê de heye. Ji bona ku xelkê li deverê jê feydeyekê bigirin, divê erdê hebe û li van deveran jî li gor nîfûsê erdê destê çend xwedî erdên mezin û zengînan de ye. Xwedî erdên mezin wê fêkiyên projeyê ji piraniya xelkê deverê zêdetir bixwin û ferqa di navbera zengîn û feqîran de jî mezintir dibe.

Di warê warê xizmetên tenduristiye de wek tê zanîna de vera projeyê di bin standardên Tirkiyê de ye. Û roj bi rojê hejmara nexweşxane, doşek, tixtor, nexweşnêr li gor nîfûsa deverê kêmîtir dibe.

Di warê bikaranîna enerjîya di çarçewa vê projeyê de jî bi dest

Dûmahîk r. 11

Rewşa problema Kurdî ya vî serdemê

Di bin vî navî de, di 24-25 Çiriya Paşîn de ji aliyê "Koma Lêkolînên Kurdî" ya Enstîtuta Rojhilataniya Akadêmî ya Zanîyariya Rusiyayê sempozyumêke zanyarî li Moskovayê pêkhat.


Di sempozyomê de li ser babetên li jêr gotar hatin pêşkêşkirin.

Bi tevayî rewşa Kurdistanê ya tomerî: M. S. Lazerev, Ismet Ş. Vanli

Çanda Gelê Kurd û astengên wê: Bavê Nazê, Lamera B. Paşaeva

Problemên Zimanê Kurdî: Z. A. Yûsûbova, R. L. Tsabolov
Di dema îro de Kurdzanî: O. Î. Jîgalîna


Tevgera rizgarîxwaziya neteweyî a Kurdî li Bakur-Nasîf Çoşkun, M. A. Hasretyan
Pîrsa dewletê li Başûrê Kurdistanê: Ş. X. Mihoyî, A.G. Cebar
Pîrsa Kurdan li Başûrê Roja-



Sakirê X. Mihoyî

vayê Kurdistanê: B. S. Resûl
Kurdên li Ciwata Dewletên Yekbûyî: Şerefê Eşîr, Kinyazê Îbrahîm

Kurdên li Ewropayê û problemên wan: Seyîd Melle, Hesen Şêxo



M. S. Lazerev

Riyên çareserkirina Problemên Kurdan: Mahîr Welat, M. S. Lazerev.

Dûmahîk: r.11

Rojeva Mehê

Mûrad Ciwan

"Heke tu bişibî min, bijî!"

Tirkiye her çend welatekî welê ye ku ji alî rewşa xwe ya civakî, aborî, siyasî û kulturî de di nav perîşaniyeka bêhed û hudûd de ye jî, bivê nevê guherîn û pêşveçûna dinyayê tesîrekê li wê jî dike, hin guherîn di wê de jî rû didin.

Gava mirov bala xwe dide guherîn û rûdanên civaka Tirk, tîn dîtî ku hema hema hemiyên wan negihayî û nekamilî ne, bi naveroka xwe ne dagirtî ne, wekî herhemên beravêtî qels, jar û çeloxwarî ne. Ji yê eslî gelek dîr in teqlid in, qelb in.

Sedemê vê yekê helbet gelek in, lê mirov dikare sedemên bingehîn nîşan bide. Civaka Tirkiyê di ger û guherînên xwe de ne li gorî guherînên û pêşveçûna vê civaka cihanî ye ku bi kamîlîbûna endamên xwe xwedanê dinamîzma serkêşîya guherîna dinyayê ye. Civaka Tirkiyê ne di nav wan civakan de ye ku "çerxa dinyayê" dizîzikînin, lê di nav wan civakan de ye ku li pey "çerxa dinyayê" dipengizin.

Di van demên dawiyê de gava meriv bala xwe dide muhawelên lêkolîn, munaqêş û tesbîten ronakbîrên Tirk, ev yek çêtir li ber çavên mirovî diyar dibin.

Heta çend sal berî niha, Tirkiyê qasî îro têkilhevî jiyana dinya rojava nebûbû, wekî îro nimetên teknîka pêşveçûyî neanîbû nav xwe. Dinya bixwe jî hinde pêşve neçûbû, yan jî welat hinde nêzikî hev nebûbûn ku rastiyên civaka welatêkî wek Tirkiyê bi vê eşkeretiya îroyîn

eşkere bibin.

Tirkiye heta dereceyekê him jî dinyayê tecrîtkirî bû, him di nava xwe de ji hev tecrît kirî bû. Wekî qutiya devgirtî, rastiyên wê, tiştê tê de him jî alî dinyayê ve û pirtirîn ji alî xelkê wê bi xwe ve gelek caran sir bûn. Herkesî heta dereceyekê bes rastiya xwe dinasî û digot qey rastiya hemû Tirkiyê wekî ya wî ye.

Dewletê jî îdeolojiya resmî jî ev rewş îstîsmar dikir û li gorî dilê xwe tabloyek yeksanî derdixist. Çi bû ev tablo? Li Tirkiyê herkes Tirk bû, herkes misilmanê sunnî bû, herkes Ataturkçî bû, herkes xwedan kar bû, bextiyar û şad bû.

Lê îro ku dinya hinde piçûk bûye welat nêzî hev bûne û çûn û hatineke muazzem di nava insanên de dest pê bûye, insan roj bi roj, seet bi seet hay ji derd û halên hev dibin, tabloya jorîn a Tirkiyê jî bi tevayî hilweşîya ye. Herkes dibîne ku civaka Tirkiyê, ne weha yekalî, basît û yeksan e. Ne tenê Tirk, Kurd, Ere, Çerkez û bi dehan milletê din li Tirkiyê hene, ne tene misilmanên sunnî, gayrî-muslim, Alevî, Şîî, Êzîdî hene. Gelek mezheb û terîqet û medreseyên dinî hene, bi dehan, sedan kultur

û siyasîyên ji hev cûda di nav civakê de dilivlîvin. Civak bi sedan aliyên xwe yê din piralî ye.

Ev piralîti, êdî ne ji dinyayê ne jî ji mirovên vî welatî nema tê veşartin. Eşkerebûna rastiya piralîya civaka Tirkiyê li gel xwe hin encamên din tîne. Berê îmkana înkarkirin û veşartinê hebû loma, hebûn û mafên wan mirovan bi darê zora dewletê dihat bindestkirin. Û ev yek jî dewletê re dima, dewletê dikarî rûreşî û zordariya xwe û li gel wê jî bêthemûliya civaka Tirk a misilman a sunnî ya Kemalîst veşêre.

Demokratên Tirk bi tehrîft û bi manipulyasyonan vê carê destpêkirine, dixwazin bidin nîşandan ku xwedîgiravî Kurd çend zêde nêzikî sunnîtiyê ye, dîndar çend bi dilsozî lasîzmê diparêzin û liberal çend hiz ji kemalîzmê dikin. Li gor demokratên Tirk şeriyeta van anasiran bi wê yekê tê qebûlkirin ku çend nêzikî realîte, rûmet û pîvanên serdest in.

Lê li dinya îroyîn, ne dewlet dikare zordestiya xwe ne jî ew civaka serdest bêthemûliya xwe veşêre. Rastî û bûyerên van rastiyan, daxwaz û muhawelên anasirên bindest ji vî alî û vî aliyê civatê serî hildidin û xwe li ber çavên cihanê eşkere dikin.

Ev yek bivê nevê ji alî ronakbîrên Tirkiyê ve munaqêşe, guftugo, lêkolîn û lêgerînên nuh bi xwe re tîne.

Li ser Kurdan, Alewîyan, dîndaran, terefdarên dîn û mezhebên din yê ne layikxwaz, li ser ermenî û Rûman, li ser mezheb, terîqet û weqfan, li ser "Cumhuriyetçiyên Nuh" li ser "liberalan" û hwd. meqale tîn nivîsîn, guftugo tîn kirin, lêkolîn û lêgerîn tîn çêkirin, di kanalên şexsî

yên televîzyonan de munaqêşe û panel tîn amedekirin.

Di hema hema hemiyên van kar û muhaweleyan de xwedîgiravî, rastiya civaka Tirkiyê tê derxistin, nasandin û qebûlkirin. Yê ku bi vê îdeyê radibin demokratên Tirk in. Lê gava mirov baş bala xwe dide van teşebusan mixabin mirov nikare bi dilekî rehet xusûsiyeta demokrasî û demokratbûnê di wan de bibîne.

Demokratbûn ew e ku ev rastî (realîte) xwe çawa diyar dikin bi wî awayî bîn qebûlkirin û bîn nasîn, tehamul û xweşhalî ji ber hebûn û mafên wan bîn nîşandan.

Lê li Tirkiyê ev yek bi vî awayî rû nade. Mirov dibîne ku, muhewela demokratên Tirk ne ew e ku, Kurdîti, Alewîti, dîndarî, yan liberalî çî ye, bi wî awayî qebûl bike û muhaweleye bike ku civaka nealewî, ne Kurd, nedîndar, neliberal bi hebûna wan aciz nebe, tehammul, tolerans û xweşhalîyê nîşan bide.

Demokratên Tirk bi tehrîft û bi manipulyasyonan vê carê destpêkirine, dixwazin bidin nîşandan ku xwedîgiravî Kurd çend zêde nêzikî sunnîtiyê ne, dîndar çend bi dilsozî lasîzmê diparêzin û liberal çend hiz ji kemalîzmê dikin. Li gor demokratên Tirk şeriyeta van anasiran bi wê yekê tê qebûlkirin ku çend nêzikî realîte, rûmet û pîvanên serdest in.

Eşkere ye ku di tu dera muhaweleyan wiha de demokratbûn nîne û civaka Tirkiyê jî bi vî awayî kultura tehamul, tolerans û xweşhalîya demokrasîyê wergire.

Ev kultur, kultura bêthemulî û despotiyê ye; nabêje ku tu bi çî rengî dibî bibe, min tu qebûlî. Lê dibêje ku tu çend bişibî min ewende tehammul ji bo te heye.

RNK'ê konferansa Rêxistina xwe ya Ewrûpayê civand: "Dengekî bi tîn û tesîr dernakeve"

Konferansa KUK/RNKê ya Ewrûpa ya îsal di 7-8'ê Çiriya Pêşin de civiya.

RNK Berpirsiyariya Ewrûpayê bi belavokekê encamê Konferansa 5'an ya RNK ya Ewrûpayê ji rayagiştî ya Kurd re diyar kir.

Belavok li ser bûyerên ku di vê sala bihurî de li Kurdistanê rûdane, disekine, li hember vê terro û qetliama Tirkiyê bêdengiya civata Kurd ya li Ewrûpayê jî di belavokê de hatiye diyarkirin. Konferans di vî warî de vê tespîtê dike: "Di vê dema ku her roj gundên me tîn şewitandin û xerab kirin, insanên me tîn qetilkirin û welatê me tîn wêrankirin, li Ewrûpayê di nava civata Kurd de, dengekî bi tîn û tesîr dernakeve. Konferansa me bawer dike ku li Ewrûpayê pêwistî bi çalakî û tevgerên hevbeş yê di warê dem û disîplîn û programê de xweş hatibin amedekirin, hene".

Konferansa li ser giringiya yekîtiya netewî rawestiyaye û di vî warî de kar û xebatên Platforma Cepha Kurdistanê Bakur jî nixandiye. Herweha konferansê li ser yekîtiya hêzên sosyalîst jî bi giringî rawestiyaye, bal kişandiye li ser kar û xebatên RNK, TSK û YEKBÛN'ê û ya berfirekirina yekîtiya sosyalîstan.

Konferansa PSK a li derveyî welat çêbû "Li hember jenosîdê bêdeng nemînin"

Partiya Sosyalîst a Kurdistanê konferansa xwe ya li derveyî welat a sêyem di hefteya duyem ya Çiriya Paşin de çêkir. PSK di belavoka dawîya konferansê de encamê konferansê jî raya giştî re diyar kir. Konferansê li ser pirsên ku di rojeva PSK de ye rawestiyaye û xebatê wan ya li derveyî welat helsingandiye.

Di belavokê de bi giranî li ser çareserkirina pîrsa Kurdistanê Bakur tê rawestandî û çareserkirina federasyonê tê pêşniyarkirin. Herweha belavok bi dîr û dirêj li ser zulum, tero û zordestiya nuha li Kurdistanê dibê radiweste û balê dikêşîne li ser bêdengiya dinyayê û bangî rêxistinên navnetewî, yê mirovperwer, welatên bi pîrsê têkildar dike û dibê "bideng nemînin, dengê xwe bilind bikin".

Civîna Nivîskarên Kurd yê li Swêdê

Ronakbîrên Kurd li Swêdê dixwazin bi rêxistin bibin. Ji bo vê yekê bi beşdariya 30 nivîskarên ji Kurdistana Bakur di 27. 11. 1994'an de civînek pêk hat.

Roja 27'ê Çiriya Paşin li Stockholmê bi beşdariya 31 nivîskarên Kurd civînek pêk hat. Rojeva civînê li ser avakirina rêxistineke nivîskaran bû. Civîna bi însiyatîf û bangkirina Malmîsanîj, Rohat, Nacî Kutlay û Munzur Çem pêk hat. Pîvana bangkirina kesan bo civînê di mana fire de kesên nivîskar bû.

Di civînê de bi giranî li ser rola nivîskarên Kurd li Swêdê

hate rawestandî û munaqêşe zêdeyî li ser şêklê rêxistinbûna nivîskarên Kurd çêbû. Li ser Yekîtiya Nivîskarên Kurd Li Swêdê hat axifin ku çima ev komele hat belavkirin. Çima nivîskarên Kurd piştgirîya vê komelê nekirin û hwd. Li dawîyê piraniya kesên beşdar di wê baweriyê de bûn ku ji nû ve komeleyeke nivîskaran were avakirin.

Ji bo amedekirina civîneke firehtir û hazirkirina destûra komelê komîteyek hat hilbijartin. Her weha wê ban kesên ku nehatibûn civînê jî bikin.

Kesên ji bo komîteyê hatin hilbijartin: **Munzur Çem, Osman Aytar, Malmîsanîj û Rohat.**

Ji bo endametiya YE'yê Swêd: "Erê" Norweç: "Na"

Li Swêdê di 13'ê Çiriya Paşin de referandûmek ji bo Yekîtiya Ewrûpayê çêbû. Ji %52.3 erê, ji %46.7 dengên na dan ji bo Yekîtiya Ewrûpayê. %0.9 jî dengên vala derketin.

Partiyên ku di Meclîsa Swêdê de ne, Partiya Venster(Çep) û Partiya Hawîrdor(Miljö) li dijî endametiya Swêdê a Yekîtiya Ewrûpayê ne. Partiya ku di hukûmetê de ye di referandûmê de ji %55 dengên "erê" û %44 jî dengên "na" bi kar anîn. Partiya Moderat(Konservativ), Partiya Liberal a Gel (Folkpartiet) û Partiya Center(Merkez) û Partiya Xirîstîyanên Demokrat herçiqas li gel Yekîtiya Ewrûpayê bûn jî gelek dilxwazên wan dengên "na" bi kar anîn. Bi taybetî jî Partiya Center %48 dengê "na" dan Yekîtiya Ewrûpayê.

Berê çendekî li Finlandiyayê jî bo Yekîtiya Ewrûpayê referandûm çêbûbû û Finlandîyan jî bi %54 dengên ji Yekîtiya Ewrûpayê re gotibûn "erê".

Norweciyan di referandûma 28'ê Çiriya Paşin de ji % 52,2 dengên "na" dan endametiya Yekîtiya Ewrûpayê. % 47,8 dengên ji "erê" di referandûmê derket.

Ji çalakîyên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Civîna Kurmancî ya Payiza 1994'an

Civîna Kurmancî ya Payiza 1994'an di navbera rojên 5-12'an a meha Çiriya Paşin de li Swêdê li girava Biskopsarmö'yê çêbû. Beşdarên civînê ev kes bûn: Reşo Zilan, Veysî Zeydanli, Kendal Nezan, Rojen Barnas, Hemîd Kiliçaslan, Muzaffer Begzade, Xusro Abdullahî, Zeynelabidin Zinar, Elî Şêr, Hazim Kiliç, Lûtîf Baksî, Musa Kaval, Zinar Soran, Mahmûd Lewendî.

Di vê civînê de ferhengok û mewzuyên hatibûn amedekirin ev bûn: Devoka Qerejdaxê (M. Lewendî), Ferhengoka Ronahîyê (M. Begzade), Ferhengoka Pewlewî (R. Barnas), Ferhengoka Huqûqî (V. Zeydanli), Ferhengoka Mem û Zîn (X. Abdullahî), Ferhengoka erebe û aletên benderê (Elî Şêr), Ferhengoka Roja Nû (H. Kiliçaslan), Rastnivîsîn (R. Zilan)

Armanç

Rojname Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewendî Firat, S. Rêving, M. Lewendî,

Redaktorê berpirsiyar: M. Elî, Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj,

Berpirsiyarê rûpelên edebî: Ehmed Huseynî

Utges av: Kurdîska Demokratîska Arbetarunionen

Aboneti/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450

SKR, Li Ewrûpa: 60 DM. Li derveyî Ewrûpa: 50 \$

Anons/ilan: niv rûpel/en halvîdan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 497 22 55-6

Adres: Box: 152 16

161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Rojnameya "Gulan"

Li Kurdistanê azad rojname û kovarên her rêxistînekê hene. Ji bilî kovar û rojnameyan, her rêxistin xwedî radyo û tv ne. Lê ev lokal in, li seranserê Kurdistanê azad nahên temaşekirin û guhdarîkirin.

PKK bi navê "Birayetî" YNK jî bi navê "Kurdîstanî Nîwê" rojnameyên rojane derdixin. Navê Tv a PDK'ê "Kurdistan" navê ya Yekîtiyê jî PUK'ê. Partiyên din yên ku di Cephaya Kurdistanî de, ciyê xwe stendine rojnameyên heftane derdixin. "Alaya Azadî", jî aliyê Zahmetkêşan, "Rêgayî Kurdistan" jî aliyê Partiya Komünîst ve tê derxistin. Turkmen bi navê "Turkmenelî" kanala tv ya wan heye û programên wê hemû patentên Tirkiyê ne.

Li derveyî rojnamên merkezî, hinek rêxistin kovar û rojnameyên herêmî jî derdixin. Li Dihokê rojnameyê 15 rojî bi navê "Peyman" jî aliyê PDK yê ve tete weşandin. Rojnamê navê xwe jî rojnama ku di sala 1909'an de li Diyarbekirê bi navê "Peyman" derketiye, distîne. Cara pêşîn ve rojname di rûpelên xwe de cih daye nivîsa Kurdî. Wer xuyaye "Peymana" Dihokê jî ji vê îlham stendiye.

Nîvê Peymanê bi tîpên latînî û nîvê wê jî bi tîpên Erebî ye. Ev cara pêşîn e ku li Behdînan bi resmî rojnameyê bi tîpên latînî tê çapkirin û Peymanê armançek wilo daye pêşîya xwe ku di duwerojê de rojnamê seranser bi latînî derkeve.

Li Kurdistanê azadiya fikrî û belavkirina rojname û kovarên curbi-cur hene û ji ber ku piraniya med-



Yayê di bin destê partîyan de ne, bêjî nebêjî ev azadî "tê şinorkirin"

Lê rojnameyê heftane bi navê **Gulan** di Nîsana '94'an de dest bi weşanê kiriye û hinek tabû şikandine, ji hin aliyên de bûye nimûna rojnamegeriya azad. Rojname bi çavê rexnegirî li bûyaran dinêre û gelek caran wezîrên hukûmetê di rûpelên rojnameyê de tên rexnekirin. Redaktorê **Gulanê**, Bedran Hîwa di vî warî de wiha digot: "Di şerê birakujîyê de hin wezîrên Partiyê çûne cephê li hember wezîrên Yekîtiyê şer kirine. Me di **Gulanê** de li ser vê yekê nivîsand. Lê Wezîrê Ziraetê Sadî Pîrê aciz dibe û nameyê jî **Gulanê** re dinivîse û di nameya xwe de dibêje ku, ev nameya wî di rûpelên yekê ya rojnameyê de bê çapkirin." Redaktorê **Gulanê** Bedran dom dîke, "me ji nivîsa wî tiştê fehm nekir û me nameya wî rast kir û di rûpelê 4'an de weşand." Û Bedran dibêje; "li ser nameya Wezîr min di kuncikê xwe de wek mizahî got wezîrên me hîn nizanin binivîsin."

Lê li gor Bedran digot ew nikarin, kak Mesûd û mam Celal rexne bikin (!!)

Navê rojnameyê jî destpêkirina

şerê pêşmergetiyê jî sala 1976'an tê. Ew şerê çekdarî piştî rûxandina tevgera Barzanî a 1975'an di 76'an di meha **Gulanê** de dest pê dîke.

Redaktorê berpirsiyar Bedran Hîwa ye, salekê li Tirkiyê maye. Bi salan di refên partiya Komünîst a Iraqê de şerê pêşmergati kiriye. Li gor wî problema herî mezin a **Gulanê** karê teknîkî û kêmasiya kadroyan e. Bedran dibêje; "ji aliyê maddî de kî pereyan bide me, em piştgiriya wan dikin".

Buroya wê di Sentruma Hewlêrê di avahiya hotel Sharaton'ê de ye. Ew hotel hîn xelas nebûye Partî dest daye ser avahiyê. Ev jî tete wê mahneyê ku PDK piştgiriya **Gulanê** dîke.

Bedran dibêje li Kurdistanê roja tatilê In e. Ji bo vê jî em rojê pêncşemîya **Gulanê** derdixin da ku xelk rojnamê bixwînin. Ji ber ku xwendevanên wê piranî kesên karmend in.

20 kes di rojnamê de kar dikin; meaşê yekî li gor karbendên dewletê bilind e- 1000 dînar e, Bedran 2000 dînanan distîne. Tîraja wê 3500 e, bûhayê wê 10 dînar e.

Faris Can

NEYNIK

Musîbeta giran û bédengiya me

Mirza Bextiyar

Kurdistanê Bakur di dîroka xwe ya nêzik de tu carî weke nuha pêrgî musîbetek weha mezin nebûye. Ne qetliam û hovîtiya dewleta Tirk a piştî têkçûna serhildana Koçgirî, ne ya Şêx Seîd, ne ya Agirî û ne jî ya Dêrsimê, ne bi vê sosretê bû.

Qetliama dewleta Tirk ya ku di sala 1938'an de li herêma Dêrsimê kir, heta van salên dawî jî di mējiyê me de kok berda bû. Sûretên sirgûnên mecbûrî yên salên piştî serhildana Dêrsimê hîn li ber çavên me ne. Ew sûretên Dêrsimiyên ku destê wan bendkirî û di stuyê wan de kindîr û di riyên sirgûnê de, heta nuha yek ji tabloya zulm û zordariya ku li Kurdan dibe bû.

Lê şerê ku dewletê îro li hember Kurdan vekirîye, teror û qetliama ku daye ber xwe tu carî nehatiye dîtî. Di van du salên dawî de li Kurdistanê Bakur li dora 2000 gund hatine şewitandin û wêrankirin, li dor 3 milyon însanan jî ciyê xwe barkirine, li nav bajaran rojê li dor 2 500 kes hatine kuştin, hejmara gundiyan bê sîc, bê sedem hatine kuştin ne diyar e. Şûna rismê Dêrsimiyên destê wan bendkirî û stuyê wan bi kindîr, nuha rismên gerilayên şewitî, termên gundiyan bi tankan girêdayî wê bi dehan salan jî ber çavên me neçin.

Ya rastî dewletê li Kurdistanê bi terora xwe mecal nehîştîye ku gel bikaribe li hember vê zulm û zordariya wê derkeve. Di rewşek weha xerab de gelo em Kurdên li derveyî welat çî dikin?

Çewa îro li welatê teror û qetliama dewletê ya nedîtî heye, wisa jî li derveyî welat bédengiyê nedîtî ya civata Kurd heye. Rêxistinên demokratîk yên Kurda ku îro hejmara wan bi sedan têt hejmartin û rêxistinên siyasî li hember van rûdanên reş bédeng dimînin. Bêyî yek-du xwepêşandanên menûn, çend belavokan pê ve çî reaksiyon nehatin organîze kirin. Salên heştêyî li hember bûyerên ku li Kurdistanê Bakur miing û xwepêşandan li Ewrûpayê dihatin organîzekirin, di dema rûdanên Kurdistanê Başûr de, çalakîyan hatin kirin, di bîra me de ne.

Helbet sedemên vê bédengiyê hene. Bi ya min du sedemên girîng yên vê yekê hene:

Yek ji rewşên Kurdistanê ya îroyîn têt. Pêlên bêmorali û bêhêvîtiyê xwe gihandiye Ewrûpayê jî. Civata Kurdên li Ewrûpayê yên ku vê rewşê dibînin û hîs dikin bi tasîra vê bêmorali û bêhêvîtiyê de cangiran dibin, bêreaksiyon dimînin. Reaksiyonên têt nişandan jî ji heyecan û ji çêşê dîr e. Ev demên dawî di gelek nivîs û komentaran de ev bédengî têt tespîtkirin, lê dîsa jî ev tespît nabin sedemê destpêka hîn aksiyonan.

Sedemê duwemîn yê vê bédengiyê jî propoganda û informasyonên ne rast yên PKK'ê ne ku tesîreke mezin li civata Kurdên Ewrûpayê dîke. PKK îro di warê leşkerî de li hember dewletê di şerê de ye. PKK jî têt de hemû hêzên Kurdistanê, ji bo morali gel bilind bibê, divê ajite û propogandayê bikin. Ev hem mafê wan e û hem jî erkeki wan e. Lê dema hinek rabin bi tenê ji bo hebûna xwe bidin nişandan, rastiya îroyîn bi awayekî din bidin diyarkirin, ev ne propoganda û ajitasyon e, ev perdekirina rastiye ye. PKK bi tenê ji bo bide nişandan ku hîn xurt e, rastiya ku îro li Kurdistanê têt jiyandin, vedîşere. Şûna trajediya 3 milyon însanan ku ji ciyê xwe barkirine derxe pêş, kuştina du leşkeran derdixê pêş. Ji alî ragihandinê ve li derveyî welat, PKK ji hêzên din hîn bêtir bi avantaj e û di warê pêkanîna rayagiştî de bi tesîr e. Ev jî sedemeke girîng e ku civata Kurd ya Ewrûpayê bikeve hereketê.

Îro ne roja bédengiyê ye. Em nikarin li hember vê feleketa ku hatiye serê gelê me bédeng bimînin. Hêzên siyasî, komelên demokratîk li her derê Ewrûpayê divê dengê xwe bilind bikin. Bi şexsiyetên naskirî ên wan welatan re komîteyên demî û bi tenê ji bo rûşkerîna weşetê ava bikin û programên çalakiyan amade bikin, di wê çerçewê de tēkilî bi parlamenter û berpirsên hukûmetên welatên lê dijîn re deynin, xwepêşandan bikin, rayagiştî ya Ewrûpayê bikin hereketê.

Mafê me tune ye ku em matmayî li qetliama ku li Kurdistanê dibe, mêze bikin!

Welatparêzê hêja Şêxmûs Yapiştiran wefat kir



Welatparêzê hêja Şêxmûs Yapiştiran di 12'ê Çiriya Paşin de ji ber nexweşîya xwe ya ku dikoran nikaribû teşhîsê bikin, wefat kir.

Ş. Yapiştiran di sala 1955'an de li Dêrika Çiyayê Mazî hat dinê. Piştî xwendina navendî û lîse li Diyarbekirê Dibistana Meslegî a Muhendisiyê xelas kir û di wê demê de ket nav xebata DDKD'ê. Ji ber xebata xwe ya siyasî piştî derbeya 12'a Îlonê hat girtin û 14 mehan di girtixana Diyarbekirê de ma û daweya wî bi daweya giştî a DDKD'ê ve hat girêdan. Di nav xelkê de û bi taybetî jî di nav hemşeriyên xwe de pir jê dihat hez kirin.

Wexta DEP hat avakirin wek nûnerê Diyarbekirê yê Partiyê di nav partiyê de aktîv kar kir.

Lê di emrekê ciwan de ji ber nexweşîya xwe wefat kir. Şêxmûs zewicî bû û bavê 3 zarokan bû. Em redaksiyona Armançê ji malbata wî re ser saxiyê dixwazin, bila gelê Kurd sax be.

Li Qamişloyê pêşengeha pirtûkên Kurdî

Hoşeng Kurdaxî/Heleb

Çendekî berê li Sûriyê pêşengeha pirtûkên Kurdî ya sêyem, ji bo herêma Cizîrê ya yekem vebû. Bi beşdariya piraniya rawestbîrên Kurd li herêma Cizîrê wek Seydayê Tîrêj, Seydayê Keleş, Salihê Heydo, Konê Reş, Bavê Helebçê, Ka-mûran Haco, Berzo, Fethullah Huseynî, Nûhat, Xelîl Sasonî, Rizo, Dildarê Midî, Qado Şêrin, Ferhad Çelebî, Ebdulbaqî Huseynî, Mihemed Şexo, Brahim Yûsif, Ferhad Eçmo û Tengezarê Marîni pêşengeh hat vekirin. Herweha nûnerên gelek rêxistinên Kurdî jî di vekirina pêşengehê de amade bûn.

Ev pêşengeh bi alîkariya pirtûkxana Xanî li bajarê Helebê, Koma Midya ya tîpa folklorê vebû û di destpêka vekirinê de gotineke xwe xwendin. Di gotinê de qala rola pênûsê di şiyarkirina gelan de, hat kirin. Herweha di xebata netewî de li ser rola rawestbîrên Kurd jî hatibû rawestandin.

Li gel pirtûkan gelek kovar û rojname jî hebûn: Gelawêj, Zanîn, Pirs, Laleş, Metîn, Stêr, Hêvî, Ya Xwendevana..... Kaset û posterên Kurdî jî ciyê xwe di pêşengehê de stendibûn....

Pêşengehê 6 rojan dom kir.



Ji milê çepê ber bi milê rastê: Kamiran Haco, Salihê Heydo, Seydayê Tîrêj, Dildarê Midî, Seydayê Keleş, Konê Reş, Tengezarê Marîni

Kultur, Asîmîlasyon û Rola Zimanî

◆ S. Roşan

Kultur, peyvek e di nav xelkê de gelekî tê bikaranîn. Kultur çî ye. Mirov ji çî re dikare bêje kultur. Pirê caran, kultur bi maneya zanîne dihê bikaranîn. Gelek caran dihête gotin filankes bi kultur e, lê bêvankes ne mirovekî bi kultur e. Li vir pir eşkere ye ku kultur di maneya zanîne de dihête xebitandin. Ango kesên xwende, kesên di civatê de xwedî kariyer, bi kultur in! Lê di eslê xwe de her mirov xwedî kultur e. Mirov û kultur bi hev ve girêdayî, du tişt in ku mirov nikare ji hev cuda bifikire. Ji ber vê yekê, mirov û kultur di nav yek prosesê de ne. Bi kurtî be jî ka em binêrin kultur û mirov çawa digêhêjin hev.

Peyva kulturê bi xwe, ji rehê xwe de, guhertina tabîatê û dest-xistina berhemên nû ye, ku bi xebata mirovî hatine wicûdê. Naveroka kulturê bixwe jî bi vê xebatê dagirtî ye. Daristanek dest lê neketî (cengel) ne parçeyekî kulturê ye; lê darên ku ji daristanan dihên birin û di jiyana insanan de ji bo rehetiyê, xweşiyê û gelek tiştên din dihên bikaranîn parçeyekî kulturê ne. Ji ber vê yekê mirov tabîeta dest lê neketî parçeyekî kulturê nahesibîne, lê tiştên ku bi kar û xebata insaniyê ve girêdayî -te divê xebata bi dest an bi meji ve girêdayî be- berhemên wan, kulturê pêk tînin. Bi rêk û pêk kirina daristanekê, vekirina erd ji bo çandinê, ajotina erdî, çandina ganim, ceh, nîsk û yên wek wan, kedîkirina pez, dewar û xwedîkirina heywanan; danîna rez, kar û xebata bi wê ve girêdayî û yên wek van xebatan hemî parçeyekî kulturê ne.

Li gel van xebatan bi destî, kar û xebatan ku bi meji û bi eqlê insaniyê jî dihên wicûdê, parçeyên kulturê ne. Ji bo guhertinê, ji bo efektîvkirina aletan, ji bo bikalîtekirina berhemên mirov li gel destê xwe, eqlê xwe jî bi kar tîne; berhemên vê yekê jî kultur in. Bi kurtî, hemî berhemên ku ji bi keda insaniyê pêk dihên û di jiyana insanan de guhertinan bi xwe re çêdikin beşekî kulturê ne. Avakirina xaniyan, wêneçêkirin, romannivîsîn, kar û barên sînemayê, tiyatroyê û sinetên din hemî dikevin çarçoveya kulturê.

Helbet gava mirov bi vê firehiyê li kulturê feke, pir eşkere xuyaniyê dibe ku di jiyana derdora insaniyê de jî bilî kulturê zêde tiştêkî namîne. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje kultur jiyana bi xwe ye. Awayê jiyana ye. Rewşa jiyana, bi awayeke komplet, kulturê pêk tîne. Insan di çarçoveya civakî de dijî û dikare bijî. Herweha berhemên kulturî berhemên civakî ne. Eger bi awayekî din bête gotin, kultur bê civakê, bê insaniyê nahête hizirandin.

Wek dihête zanîn, heywan li tabîetê çî hazir bibînin qîma xwe pê tînin û jiyana xwe bi wî awayî didomînin. Roleke wan a aktîf nîn e. Lê mirov di vî wî de ji

heywanan pir cuda ne. Ew qîma xwe bi tiştên hazir naîne. Ew di guherîna tabîetê de roleke aktîf dilîze. Bi meji û keda xwe ya dest, dibe sebebê guherandina tabîetê. Bi vê prosesê ew bi xwe jî dihête guhertin. Ji çalakiyên xwe tecrûbeyan werdigire. Hingî diçe zidetir xwe bi awayekî mantiqî rûber me dike. Ev tecrûbe û zanîna hezar salan prosesesa xurtbûn û têkûzbûna insaniyê li dij tabîetê bi rêkûpêktir dike. Berhemên kar û xebata insanan ji nîşan derbasê nîşan dibe.

Bi keşîfkirina nivîsê, zanîna mirovî jî wendabûnê xwe rizgar dike. Nivîs dibe mejiyê nemir. Parastina kulturê, bi çêkirina şiklan û dîtina elfabeyê, di dîroka insaniyê de dibe qonaxeke pir bilind. Bi nivîsê re kultur hêdî hêdî şiklên cûr be cûr digire.

Baş e, heger kultur berhemên xebatê, keda insaniyê û civatê ye,

Gava zimanekî biyanî dikeve nav jiyana mirovî de, heger bi hatina xwe di prosesa fikirîn, afirandin û xwenuhkirina insaniyê de bi awayeke serdest cîh bigire, ew dê bibe sebebê gelekî guhertinan. Ango zimanê nûhatî ne tenê wek zimanekî biyanî dihê! Ew bi xwe re kultur û fikrên di wî zimanî bi xwe de parastîne jî dihêne. Gelek norm, usul û qaîdeyên guhertî di nav xwe de diparêze, bi tevê van bi awayeke komplet di zanîn û xwenasîna insanan de bi cîh dibe. Zimanê biyanî tevliheviyê girift di jiyana kesên zimanfêrbûyî de peyda dike. Fikrên pircûre xwe hêdî hêdî di zanîna mirov de bi cîh dikan. Lê belê ev prosesa han bê zehmetî û pirsgerêk nayê pê. Her weha ideolojî û kultura biyanî dibe sebebê nakokiyên nû di nav civatê de. Her çiqas kultura kevin xwe nikaribe bi temamî biparêze jî, bi gelek şeweyan xwe diêxîne nav ya nûhatî. Dibe sebebê guherîna wê kulturê bi xwe jî.

ma gelo mirov dikare bibêje ku kulturê jî hev cuda hene? Ger bersiva vê pirsê erê be, çî ne ev kulturê jî hev cuda, çawa xwe şanî me dikan. Gelo mirov dikare bêje kulturê çînî, netewî, ferdî, bajarî, gundayetî hene? Heger mirov bi awayekî kurt li pirsê feke, dê xuya be ku kulturê jî hev cuda hene. Lewra civat bi xwe ne parçeyêke homojen e. Ji ber ku jiyana bajar û gundan jî hev cuda ye, pir normal e ku pêwistiyên wan jî cuda bin. Berhemên wan jî dê ji hev guhertî bin. Şiklê jiyana wan dê ji hev cuda be. Dê xwestin û hêviyên wan jî hev cuda bin. Derûdora wan dê li ser jiyana wan tesîrên cûr be cûr bike. Ev dê bi xwe re kulturekî jî hev cuda pêk bîne. Di civakê bi xwe de jî, pir eşkere ye, dê kulturê jî hev bi ferq hebin. Ev cudabûn, ji jiyana kategoriyên insanan di nav civakê bi xwe de der dihê. Wek dihête zanîn ev şiklên kulturê cuda di gelek nivîsên edebî, wek roman, helbest û çîrokan de hatine ser zimanî. Ji hêla de ve cudabûna kultura xwe di warê jiyana civakî de li ser esasê neteweyan jî

nîşa dide. Zimanê jî hev cuda, jiyana jî hev guhertî, dîroka jî hev cuda, tabîet û cografyaya jî hev cuda, rewşa siyasî ya jî hev cuda, hemî bi hev re stîleke îxweserî di nav neteweyan de peyda dike. Lê divê bête gotin ku ev tişt nabe sebeb ku mirov bêje di tu warî de kulturek hevbeş nîn e. Pir eşkere ye, civat, netewe, ferd û kategoriyên civakê hemî li ser kurreyê asîmanekê dijîn. Pir normal e ku tîkiliyên insanan, gelan û civakan bi hev re çêbe; û ev bi xwe re tesîra kultura li ser hev peyda dike. Di jiyana de ev rewşa han ber bi çav e.

Li milekî din, em dizanin ku arkeolojî di warê kulturê kewnare de roleke mezin digire ser milê xwe. Bi saya arkeolojiyê em zanîna xwe di derheqê dîroka kevin de zêde dikan. Mirov bi rehetî dikare bêje, berhemên binerd yên antik beşeke kultura gelan ya veşartî pêk tînin. Ev kultura veşartî gava rûyê zemîn dibîne, bi lez û bez xwe li ber destê pisporan bi awayeke qedr û qiymet

in inkara kulturê cuda bikin; an jî wan kulturê cuda îpaşdemayî û îkevneperestî nîşan bidin. Em dizanin ku li Tirkiyeyê hebûna neteweyên cuda nahête qebûl kirin. Li Tirkiyeyê dezgehên dewletê, yên ku kulturê din tar û mar dikan, bi zanayî û awayekî bi rêk û pêk, bi plan jî bo tunekirina wan kultura kar dikan. Folklor, stran, ziman, çîrok di destê wan dezgehên de form û naveroka xwe ya eslî winda dikan. Xweşî û dewlemendiya zimanê orjînal bi guhertinê, hesta xwe ya hundurî winda dike. Di destê dezgehên talanker de, dikare bikeve her qalibî. Stranê ku bi zimanê orjînal xweşî û bedewiya xwe bi guhdaran didin hiskirin, gava bêtûr di hêne talankirin tu xweşî û bedewiya wan namîne. Û di ser de jî, yên nijadperest û talanker, dewlemendî û tesîra kultur û folklorê zimanê orjînal înkâr dikan!

Li vir pirsêke di derdikeve holê. Gelo ev tesîra kultura di nav gelan û civatan de çawa xwe nîşa me dike. Zordestî di vî warî de heye an na. Ma kulturê serdest, yên ku xwe li ser hin kulturê din bi awayekî neheq nîşan dikan hene? Bi çî şeweyî ev pêk tê? Li vir, divê mirov dan û stendina di derbarê kulturê de, di nav civat û neteweyên cuda de bi şeweyekî dostane; û bi cihanîna serdestiya kultura ya bi qanûn û fermanan jî hev cuda bike. Bê şik tîkiliyên civatê cuda de bi xwe re tesîrên di warê kulturê de peyda bike. Ev tiştêkî pir tebîî ye. Tu civatek an neteweyek bi tîna serê xwe nikare jiyana xwe bidomîne. Heger jî ber şertên siyasî hin dewlet rê li ber vê prosesê bigirin jî, lê heta hatayê ev rêlêgirtin nikare bibe siyaseteke herdemî. Îro roj jî ber pêşketina teknîkê, ji ber rola televîzyon, radyo û dezgehên çapemenî yên din, tu civatek nikare xwe bi temamî ji van îtesîrên kulturê cuda biparêze. Ev tesîrên he normalin û tabîî ne. Li dijî vê prosesê rawestan bêfeyde ye. Ya girîng dewlemendî û xweşiya kulturê cûr be cûr û plûralîzma di derbarê kulturê de û rêkxistina tîkiliyên wekhev di çarçova atmosferêke demokratîk û azad de ye. Ango divê jî hemî kultura re azadî, firseta xwejiyandin û domandinê hebe.

Ziman û kultur

Mirov bi saya zimanî dibe beşerekî kulturî. Bi zimanî, insan dikare xwe ji xwe derbasî radeyêke bilindtir bike. Ew ilmên ku bi zimanî dihêne vicûdê cardin bi wasita zimanî dihêne munaqesekirin, berbipêşxistin û firehkirin. Insan bi wasita zimanî xwe ji tengasiya lêgerîna bi dest, çav, guh û lîngan rizgar dike; angû bêtî ku bibîne an bibihîze, bi zimanê nivîskî dikare armanç û xwestina nivîsevanekî, fikrekê, bi şiklên cûr be cûr li ser kaxizekê bixwîne û tîbîgêhêje. Zimanê nivîsê, bêtî ku mirov bê cem hev, dibe wasiteya bi hev re munaqesekirin û hevdiînê! Herweha zimanê nivîskî dibe sebebê

peydakirina gelek hestên hevbeş di nav neteweyekî.

Gava zimanekî biyanî dikeve nav jiyana mirovî de, heger bi hatina xwe di prosesa fikirîn, afirandin û xwenuhkirina insaniyê de bi awayeke serdest cîh bigire, ew dê bibe sebebê gelekî guhertinan. Ango zimanê nûhatî ne tenê wek zimanekî biyanî dihê! Ew bi xwe re kultur û fikrên di wî zimanî bi xwe de parastîne jî dihêne. Gelek norm, usul û qaîdeyên guhertî di nav xwe de diparêze, bi tevê van bi awayeke komplet di zanîn û xwenasîna insanan de bi cîh dibe. Zimanê biyanî tevliheviyê girift di jiyana kesên zimanfêrbûyî de peyda dike. Fikrên pircûre xwe hêdî hêdî di zanîna mirov de bi cîh dikan. Lê belê ev prosesa han bê zehmetî û pirsgerêk nayê pê. Her weha ideolojî û kultura biyanî dibe sebebê nakokiyên nû di nav civatê de. Her çiqas kultura kevin xwe nikaribe bi temamî biparêze jî, bi gelek şeweyan xwe diêxîne nav ya nûhatî. Dibe sebebê guherîna wê kulturê bi xwe jî.

Wek îdeolojiyên pircûre îdeolojiya dîn(ol) jî li ser bîngehekî xwe pêşkêşî mirov dike. Bi kultureke xweserî bi zimanekî olî û pîrozî dixwaze di nav civatê de bi gewde bibe. Sentralîzmê pêk bihîne. Lê gava dîn bi zimanê gelêrî (zimanê ku her etnogrûb pê dipeyîve) dihête şirovekirin û belav kirin, sentralîzma xwe winda dike û desentralîzm dikeve cîhê wî. Bi vî awayî kultura orjînal xwe diêxîne nav îdeolojiya nûhatî an jî nuhnivîsî. Dibe sebebê guhertin û şikilgirtina pircûre. Ji ber vê yekê gelege ferq di nav bicihanîna qaîde û normên olî de, herçend mirov jî yek olê jî be, peyda dibin.

Ev nimûne hemî nîşana rola zimanî û kulturê ne di civatê de. Bê şik ev guhertin û prosesa di vî warî de ne prosesêke kurt û rojane ye. Ev prosesa he demêke pir dirêj û aloziyên pircûre ihtîwa dike.

Li Kurdistanê

Heger mirov li gel van têbîniyan, li rewşa kurdên bakurê Kurdistanê binêre, dê bibîne ka çî aloziyên mezin li pêşiya kultura neteweyî û zimanê kurdî hene. Li Tirkiyeyê fêrbûna zimanê tirkî jî bo kurdan ne prosesêke pasîf e. Ev prosesêke heta tu bêtî aktîf e û di lawazkirina zimanê kurdî de metirsiya herî mezin e. Divê du tişt jî hev bihêne cudakirin; fêrbûna zimanekî biyanî jî aliyê ferdan ve û asîmîlasyona bi darê zorê. Helbet fêrbûna zimanekî biyanî karekî girîng e. Pozîtîf e. Lê berî her tiştî divê zimanê zikmakî bête fêrkirin. Ji ber ku ya herî tabîî ev e.

Zimanê tirkî di prosesa asîmîlasyona kurdan de ne tenê wek zimanekî biyanî xwe nîşa dike. Ango wekî îngilîzî, fransîzî û hwd. Bi polîtîkaya dewletê û bi naveroka xwe ew(tirkî) dibe sebebê

Belgeyên ku nû çap dibin

Çûna Barzanî bo Sovyetistanê -II- "Barzanî li Moskovayê di akademiya leşkerî de dixwend"

Min xwe nexist nav vê axavtinê, lê min bi baldarî guhdarî kir. Piştî ku axavtin xelas bû, di du saetan de ji min re eşkere bû ku ev plan bi aramanceke îdeolojîk li ser xeyalên komîta navendî a partiya me li Staraja Ploşyad hatiye avakirin. Barzanî ji min re got ku dixwaze meqerê serbazên xwe şani min bide. Em çûm odeyekê ku dor sîh kesan di rewşa "amade" de rawestiyabûn. Dema em nêzîkî wan bûn, hemû bi hevdu re daketin ser lep û kabokan û bi çarlepkan hatin ber bi Barzanî de, jê tika dikirin ku karibin bên dest guhkên qapûte wî û gîzma wî bidin û maç bikin. Wê demê temamê sûretên di derheqa Kurdistaneke demokratîk de ji aqilê min derketin û çûn.

1 Nisan 1952, Barzanî bi malbata xwe û hevvelatîyên xwe re li nêzîkî Taşkent, di kolhozê mezîna de bi cî bû. Dema ez û Mantjka hatin Moskovayê, biryara ku wê Kurd li wir bibin xwediyê otonomiyeke xwe îdarekirinê hat dan. Wê Wezareta Ew-

lekariyê alikariya perwerdekirina wan a leşkerî û pewendiyên wan bi Kurdên li derveyî welêt re, bikira. Me dikir ku em karibin hinek ji peyên Barzanî bikin ajanên xwe û bi vî awayî çend Kurdan ji nav wan bi xwe ve girêbidin, lê hewldanên me ji hêla heza ewlekariya Barzanî ve dihat xerakirin. Zemskov ê ku Kurd hîna berê li Îranê nas dikirin, serbazekî Barzanî yê nîzm ku li akademiya leşkerî dixwend, kir zîlamê me, lê dema ew zîlam carekê vegeyriya Taşkent, bê şop wenda bû. Me tu carên din nema ne ew dît û ne jî tiştê jê bihist. Em gihan baweriya ku hatiye kuştin.

Cara yekem pîrsa Kurdan bi hewcedariya biryara polît buro bû û ez ketim nav karên burokratîk. Wê çaxê Îgnatiev gotibû min heta ku ewraqên pêşniyarên me tê de ne bîr qebûl kirin, divê tu li buroya Mantjka rûnê. Di rewşên normal de Îgnatiev nerm û cirxweş bû, lê wê rojê, dema min jê re got ku civîneka min a ecele li oteke Moskova bi Barzanî re heye, Îgnatiev ji ber ku min girîngiya vê bûyerê a ku komîta navendî biryarekê li ser bigire nedîtibû, bi awayekî hişk erza min şikand. Ji bo ku pêşniyara me di civîna xwe de qebûl bikin,

Îgnatiev ji bo tikayê bi min û Mantjka re hat ba Molotov û Vişînskî. Ez berê jî gelek caran bi Molotov û Vişînskî re rûniştibûm. Lê wê carê ez pê hisiyam ku herdu jî êdî extiyar bibûn, sist bibûn û westiyayî xuya dikirin, lê dîsa jî ketin êksê û xet li ser beşekî ji pêşniyara me xistin. Nedibû ku em di pêşniyarê de bêjin wezaretê derve, di dan û stendinê di derheqa pîrsa Kurdan de, ji hinek vatîniyan berpirsiyar e. Herduyan jî dixwestin ku polît buro, ne bi daxwazê hevbêş a li ser navê wezaretê derve û wezaretê ewlekariyê, lê hew li ser daxwaza

Li gor peymana ku me bi Barzanî re girêdabû, heger ku li Iraqê hukûmeta Nuri Seîd bi-hata xistin, me ê piştgiriyeke bêdawî di derheqa serxwebûna Kurdistanê de bida Barzanî. Lê em di salên 1970-yê de li Kurdan quliptin û me şerê wan bê piştgirî hişt. Ji bo xistina rejîma Bexdê, Amerîkaniyan jî dûre soza alikariyê dabû Barzanî, lê di rojên teng de soza xwe neanin cî û piştgirî nedan Kurdan. Kurd bi awayekî xerab hatin xapandin.

rast dît.

Komediye jî vir û pê de dest pê kir. Me pêşniyara xwe bir da Îgnatiev û wî bi xwe qebûl kir. Ew nama fermî ku wê bi pêşniyarê re bihata rêkirin, ji bo wî girîng bû. Diviyabû ji bo dema qebûl bikin û imze bikin, navên endamên polît buro li ser hebe. Îgnatiev sê caran emir da min û sekreteran ku em rêza navên endamên polît buro li ser nama bi ewraqan re biguherin. Ji Mantjka pîrsî bê ma gelo divê nava wan li gora rêza alfabe binivîse, ya jî pêşî navên endamên komîsyona ekstern binivîse. Heger ku wîlo bikira, navê hevrê Kruşçov berî ê Bulganî dihat nivîsandin. Gelo ne diviyabû navê hevrê Beriya berî navê hevrê Malenkov bûya? Van û tiştin din wek van tiştên ku sedema tevliheviyan e ez şaş hiştim, lê diyar e Mantjka di derheqa amadekirina nava wan de ekspert bû, dest pê kir û çend şîretên baş di derheqa rezkîna nava wan de li Îgnatiev kirin. Sekreterên Îgnatiev bi xwe jî şaş bibûn ku wîlo gelek caran namê ji nû de dinivîsin û guhertina ku dikin hew rêza navên endamên polît buro ye.

Buhara 1953-an, dema min û Barzanî hîna carê hevdu didît, su-

wezaretê ewlekariyê tenê pîrsa Kurdan bigire rojeva xwe. Bi vê daxwaza guhertina nû ku diviyabû em di ewraqandê bikin, em ketin pêşiya parêzgerê ku rahîştibû çentê me ê ewraqan jî, em ji ba wan derketin. Min ji Mantjka re got a baş ku em herin buroya min a li Lubyanka û ewraqan ji nû de li wir binivîsin. Îgnatiev pêşniyara min



General Mustafa Barzani

cekî girîng ê ewlekariyê qewimî. Barzanî li Moskova di akademiya leşkerî de kursek dixwend. Min jî wê demê li wir dixwend. Rojekê ez li wir bi kincên amirhêz (major= albay) dîtîm. Bi alikariya serpelekî (løjtnant= teymen) ciwan ku wek tercuman pê re bû, çav da min û ji min re got: "Ji bo ku ew kesê li ser navê hukûmeta Sovyetan bi min re di dan û stendinê de ye jî leşkerêkî bilind e, ez gelekî kêfxweş im". Min ji bo xwendina wî ya ku mabû, daxwaziye xwe ên serketinê pêşkêş kirin.

Cara dawîna dema min Barzanî dît, ne gelekî berî ez bêm girtin bû. Barzanî ez li kuça Gorkî dîtîm û ber bi min de hat. Bê guman dixwest di derheqa pisgîrêkên xwe de bi min re bixavê. Lê min deng nebîr xwe û min nexwest pê re têkevime, berî ew bigihe min, min xwe di nav xelkê de ji ber çavên wî wenda kir.

Barzanî, baş zanibû ku pêşeroja Kurdan maye li ser şarezabûna wan ku karibin welatên mezîna di derheqa Rojhilata Navîn de bixapandin û bala wan bikişînin ser xwe. Divê mirov qebûl bike ku

dixwest em intresa xwe ya siyasî di derheqa Rojhilata Navîn de eşkere bikin. Ev awayekî şer, ku me dixwest em karibin Bîranya û Emerîka pê di herêmê de bişkinin bû. Ji ber ku qewet ne li gor dilê me bûn.

Salên 1960, dema hukûmeta Nuri Seîd bi destê leşkeran hat xistin em jî di nav de bûn, Sovyetistanê di herêmê de dostên ji Kurdan hîn xurttir peyda kirin. Trajediya ku hat serê Barzanî û Kurdan, ji ber intresa siyasî a welatên rojava û ên rojhilat bû. Wek ku hinek welatên Ereban û Îran jî dikin, me dixwest em Kurdan di herêmê de ji bo tirsandina ên li hember xwe bi (kar) bînin, Kurd listik bûn, ji bo herêma di nabêra Tirkiyeyê, Îranê û Iraqê de listik bûn. Salên 1950, li herêmê Kurd tenê hevalbendên Sovyetistanê bûn, lê dûre hevalbendîya me ya bi Iraqê û Suriyeyê re bû bîngêhê siyaseta me ya stratejîk a rojhilata navîn. Bi baweriya min, îro ji bo Kurdan çareyeke nêzîkî aqilan, dikare di bin garantiyeke navneteweyî de, babetekî serxwebûna bi sînor be. Ne welatên rojhilat, ne ên rojava û ne jî welatên Ereban dixwazin ku Kurd bi awayekî ku karibin petrola Mûsilê kontrol bikin, bibin xwediyê komareke Kurdan a serbixwe.

1963-an, dema ez di zindanê de bûm, min pêşniyarek nivîsand. Min di pêşniyara xwe de eşkere kir ku rewşa me li Rojhilata Navîn ne baş e û divê em dîsa pêwîniyan bi Barzanî re deynin. Li gor agahdariya ku dan min, pêşniyara min hatibû qebûl kirin û gotin ku ji bo ku Kurd karibin xwe di warê xwe de li hember êrîşên cezekirinê ên leşkerên Iraqê biparêzin, me çek û fişek gihanîne wan. Ev car bi xwe jî tê de, eşkere bû ku me bi hewldanên xwe dixwest em Kurdan bikin hevalbendên stratejîk û bi alikariya wan serdestên Iraqê kontrol bikin. Ev siyaseta bi ser neket.

**Werger ji Swêdi:
S.Bengîn**

Molotov: Wezîrê karê deve û serokê Komîta Informasyonê bû.

L. Beriya: Ji sala 1931 pê de sekreterê yekem ê Partiya Komunîst a Gurcîstanê û hemû Transkafkasya bû. Salên 1938-1953 Wezîrê karê navxwe bû.

Abakumov: Wê demê Wezîrê ewlekariyê bû.

Îgnatiev: Piştî Abakumov bû Wezîrê ewlekariyê.

Vişînskî: Piştî Molotov bû serokê Komîta Informasyonê.

Bulganî: Mareşal e. Wezîrê parastinê bû.

Bagîrov: Wê demê serokê Partiya Komunîst a Azerbeycanê bû.

Staraja Ploşyad: Navenda Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetan li wir bû.

Wezîrê Darayî û Aborî Dara Şêxnûrî: "Butçeya Partî û Yekîtiyê ji ya me pirtir e"

Endamê Redaksiyoana Armançê Lewend Firat li Hewlêrê bi Wezîrê Darayî û Aborî Dara Şêxnûrî re peyivî.

Armanç: Wezareta Aborî û Darayî bi çi karî mijul dibe, kîjan dezgeh girêdayî we ne û di wan dezgehên de çend personal kar dikin

Dara Şêxnûrî: Berî her tiştî Wezareta Darayî û Aborî wezareteke gelek mezin e, ji bo wê çend ofîs û daîreyên kevn hebûn ku ji hukûmeta Iraqê mabûn, di destê me de ne, lê nuha ew kar nakin. Wan hinek şîrketê çêkiribûn; wek nimûne şîrketê ereban û perçeyên ereban, wan jî ji derva danîn û difrotin, ew fermanê berî nuha mane û karê wan jî tune. Herweha 4 şîrket jî destê me de mane û karê wan jî tune.

Beşê me yê gumrukê heye, beşê malîyê heye (komkirina baca), daîreyên hukûmetê girêdayê me ne û daîreyên ku karûbarê teqawûdan dinêrin ew jî girêdayî me ne. Çar muduriyên giştî yê me hene. 1- Muduriyeta dîwan (mesulê personal), 2- Muduriyeta Darayî, 3- Muduriyeta gumruk û hatinan, 4- Ticaret. Bankaya me jî heye, ev banka merkezî ye û navê wê Bankaya Herêm e. Bankaya Herêm mesûla hemû bankayên din in.

Wezareta Darayî û Aborî berpirsiyarê peydakirina pere û îmkanan e. Em pereyan ji bo wezarêtin din peyde dikin û ew waxta pere peyde dikin jî lazim e bînin bidin me. Karê me yê esasî ev e.

Kurdistan weran û kavil bûye, piraniya aboriya me çûye. Û gelek zahmetî derdixê ku em planê jî bo Kurdistanê çêbikin; û gelek zahmet e em li derve û li hundir pereyan peyde bikin. Ew Kurdên derve jî alîkariya me nakin û heta nuha me ji derve pere peyde nekiriye. 7 hezar karmend girêdayî me ne.

Armanç: Çavkaniyên Wezarate we çi ne? Hatina û çayina we çawa dibe, butçeya we ya salekê çiqas e?

D. Şêxnûrî: Du butçeyên me hene: 1- Butçeya ji bo mesref û meaşên hukûmeta herêma Kurdistanê. Ew milyarek û 630 milyon Dînar e. Û ya din jî butçeya planê ye. Ew jî wek nimûne em çawa dikarin gundekî ava bikin, elektrîk û ava wê çawa tîmîn bikin, ev jî nêzikî milyar û nîv e. Wek hûn dizanin rûdanên dawî gelek tesîr li ser butçeya me kir. Em ji meha 5'an heta nuha (heta Tebaxê) mesrefên hukûmetê ji pereyên ku me ji bo rojên reş veşartibû dikin. Ew rojên reş hatin û me jî ev pere xerc kirin.

Armanç: Sîstema we ya baxstendî çawa ye? Hûn çawa bac berev dikin, pîvan çi ye û yên ku hûn bac ji wan distînin we qeyda wan ji ber xwe çêkiriye?

D. Şêxnûrî: Heta nuha jî em nikarin bêjin ku me sîstemek bacê bi rêk û pêk çêkiriye. Di eslê

xwe de sîstema bac berê jî li Iraqê tunebû. Çunkî Iraq welatekî dewlemend bû, ji bo her tiştî hukûmetê pere daye û pêwîst nedîtiye ji xelkê bac bistîne. Ji bo wê jî gelek caran jî wexta xwestiye bac bistîne, dawiyê dîsa efû ji wan re derxistiye. Mesele tev fermanê Iraqê bac nedane; ji doktor û eczacîyan re jî abûqat û hakimîyan re efû derxistiye.

Em nuha dixwazin gav bi gav sîstema bacê bi cî bînin; hatinên xelkê yê sabît tespît bikin. Em zêdetir bac ji kesên ku ticaretê dike, distînin. Wexta kesên ku diçin ji Tirkîyê mal tinîn, komîteyê me li ser sînor heye, ev komîte li mal û ewraqên wan dinêre, li gorî wê bac ji wan distîne. Sala çûyî baca me ji sedî pînsed zêde bû. Yanî dihat me li gorî 91-92'an 500 cara zêde bû. Lê hîn jî ev gelek kême e. Çunkî sîstema ku hukûmeta Iraqê danibû ji bo me bêbingeh bû. Lê em hîn jî nikarin bêjin me serketineke mezin bi dest xistiye.


Armanç: Şerê birakujiyê çi tesîr li ser karûbarên we kir? Hatina ji gumrukê, alîkariya ji derve te çawa te parve kirin û çi para hukûmetê dikeve?

D. Şêxnûrî: Alîkariya ku ji derve tê, ew nakeve destê Hukûmeta Herêma Kurdistanê. Ev alîkarî diçe bo wan organîzasyonên ku ew bi xwe li Kurdistanê kar dikin. Ji aliyê din ew pereyên ku tên bi wasita wan tînin Kurdistanê jî naynin bankayên Kurdistanê nagehurînin. Ew diçin bazara reş digehurînin û serf dikin. Min bi xwe çend caran hewil da ku ew ev pereyan li sîka reş hûr nekin. Lê ez bi ser neketim. Lê hêvî heye ku di duwarojê de ew pereyên xwe bînin bankayên me razînin, bi riya bankayan bigehurînin.

Ji şerê birakujiyê re em dibêjin şerê xwekujî. Em xwe bi destê xwe dikujin. Nuha çar mehên dawiyê hatinên herême nakeve destê hukûmeta me. Kîjan partî li ku desthilat be ew hatin jî di destê wan de ye. Bes em bi hêvî ne ku aşû hebe dê ew dîsa bê ber destê Hukûmeta Herêmi. Ev çar mehên ku pere di destê hizban de mane, soz dane ku teslîmê hukûmetê bikin.

Armanç: Wek te zanîn li dewletên Rojava Wezareten Mallî berpirsê kesên bêkar in jî û ji wan re projeyan çêdikin. Wek ku min dît li Kurdistanê hejmarê kesên bêkar gelek in. Gelo wezareta we bi vî karî mijul dibe, ku mijul dibe gelo we di vî warî de çi gav avêtine, hewldanên we çi ne?

D. Şêxnûrî: Planên me hebûn ji bo mesela bêkariyê. Lê ev şerê xwekujiyê bi rastî planên me hemû dan sekinandin. Em nikarin tiştêkî çêkin. Çunkî berê salekê rewşa me gelek xerab bû. Me di vî sala dawî de hinek îmkân bi dest xistin ku di vî warî de bi kar bînin, lê ev şerê birakujiyê çêbû û ew îmkân jî ortê rabûn. Lê li gel wê jî ne tenê bê-



Dara Şêxnûrî: "Ji şerê birakujiyê re em dibêjin şerê xwekujî. Em xwe bi destê xwe dikujin. Nuha çar mehên dawiyê hatinên herême nakeve destê hukûmeta me. Kîjan partî li ku desthilat be ew hatin jî di destê wan de ye"

karî meriv kare bi şerê birakujiyê ve girêde, berî şer jî ev bêkarî hebû. Ji ber heta nuha tu dewletê îtîrafê resmî bi me nekiriye. Du ambargo li ser me ne. Yê ku berê karê wan hebûn îro bêkar mane. Mesela fabrikeyê me ya çimentoyê hebû, herroj karibû 6 hezar ton çimento biafrîne, ev sê sal in ku ew ne di faliyetê de ye. Nêzikî 4 hezar kes kirêkarê wê hebûn. Sebêbên wan tiştan ambargoyê, ambargo tesîrekê negatîv a mezin li ser ewşa aboriya me kiriye. Tiştên me hene lê em nikarin bişînin derveyî Kurdistanê daku bifiroşin. Tiştên ku em hewcedarên wan in em nikarin bikirin, dê merov çawa karibe rewşa aboriyê baş bike. Nuha ne wekî berê ye. Berê welatekî mezin karibû aboriya xwe ya serbixwe çêke. Îro ew welatên mezin jî nikarî vî tiştî pêk bînin. Ji ber ku aborî bûye alemî, aborî aboriyê alemî ye. Bêalîkarî û hevkarîyê aborî kes nikare aboriya xwe bi ser xe. Nufûsa me 3 milyon e, 3 milyon çawa di kare her tiştê xwe bi destê xwe çêke, ligel wê jî ew nikare tiştêkî bifroşe derve û ji derve jî tiştêkî bikire. Ku bi vî hawî dom bike dê birçîtî jî çêbibe, bêkarî hîn zêdetir bibe. Li gor dîtina min nuha bêkarî jî %50'î zêdetir e.

Em carek din dibêjin bê alîkarî gelek çetîn e. Em nikarin neft bifiroşin, ev qedexê ye. Perçe û ale-tan jî bo fabrikan em nikarin bikirin, ev jî qedexê ye. Berhemên ziraetê em nikarin bifroşin Îran û Tirkîyeyê. Em jî nizanin çibikin. Dê birçîtî jî çêbibe û koç jî çêbibe. Daxwaza me ji Kurdên derveyî welêt ew e ku xebat bikin da ku ambargoyê li ser Kurdistanê rakin.

Armanç: Heta nuha çi seredanên we li derve çêbûne û we çi ji wan daxwaz kirine?

D. Şêxnûrî: Seredanên remî yê me çênebûne. Heta nuha tu dezgeh û hukûmet dawetêkî resmî ji me re neşandiye; lê ji bo konferansê, kongreyê yan jî sêminerekê dawet ji me re hatiye şandin, lê dîsa ew jî ne resmî bûye.

Bes gelek biyanî tînin cem me. Wexta ew tînin cem me, em her tiştî jî wan re dibêjin. Ji siyasî heta aborî em her daxwaziyên xwe ji wan re dibêjin.

Armanç: Mesela dewle-tên federe qet peywendî bi we re dananîne, mesela eyaletên Almanayayê.

D. Şêxnûrî: Yanî wek hukûmetê çênebûye. Lê wek parlamento du-sê ciyan ve çêbûye. Belkî di vir de hinek xetayên me jî hene, çunkî nûnerên me yê Ewropayê diyar e di vî warî de gelek aktîv nîn in, şeraze nîn in.

Armanç: Kak Dara nûha jî em li ser pirsên ku heta nuha di çapemeniya Kurdan de nehitine çap kirin bisekinin. Mesela meaşê we çiqas e? Karmend çiqas distînin, hûn bawer dikin ku meaşên wan têra wan dike?

D. Şêxnûrî: Meaşên wezîran 3000 Dînar e. Meaşê parlamentaran 4000 dînar e. Karmend di navbera 300-500 Dînar meaş distînin. Asgarî meaş 300 Dînar e.

Armanç: Di raya giştî ya Kurdan de ev tişt heye ku wexta kesê dibe walî yan jî wezîr gelek dewlemend dibe. Ev tişt li wela-

tên din jî hene. Yan ew bertil distînin, yan jî butçeya xwe rast nişan nadin, Ger hûn objektîv bêjin li Kurdsitana Iraqê tiştên weha hene yan na?

D. Şêxnûrî: Tiştêk wilo nîne. Hûn bi xwe dizanin em di rewşê gelek xerab de ne. Rewşa xelkê gelek xerab e. Bawer bike gelek kes hene ji wezîran baştir dijîn. Malên ku wezîr tê de rûdinin jî malên hukûmetê ne. Malên wezîrên me nikarin bibin malên kirêkarkî Swêdî. Ez dibînim li her cî dizî heye. Li Ewropayê jî heye. Li ciyên din jî dizî çêdibe, bertil heye. Dibe ku fermanê besît, li gumrukê yan jî li ciyekî din bertileke bixwe.

Armanç: Pêşeroja dewleta we dê çawa be? Millet azad lê zikbirçî ye. Azadiya zikbirçî nabe. Sê çar sal weha nabe bajo. Dê çi bibe, hûn çi difikirin?

D. Şêxnûrî: Ez welatparêz im. Millet bi zikbirçî jî azadiyê dixwaze. Azadî li ser her tiştî ye.

Em 30 sal zêdetir di nav şoreşê de ne. Gelek kes hatine kuştin, gund wêran bûne, çekên kîmyevî li hember me hatine bi kar anîn; lê dîsa jî millet tim azadî xwestiye.

Teclubeyên me jî nişan dide ku gelê Kurd hertîşt qebûl dike lê bindestî qebûl nake. Naxwaze careke din dîsa bikeve bin destê Seddamî. Ger ne weha bûna rîya navbera me û Iraqê vekiriye û tu sînor tune, herkes dikare biçê Baxdayê, Misulê û Kerkûkê lê heta nuha kes neçûye. Herkes serbest e dikare ji Kurdistanê derkeve, em jî tu kesî re astengî dernaxin, lê dîsa 3 milyon kes li vir mane ew jî bo azadiyê mane. Lê tiştêkî negatîv heye ew jî şerê birakujiyê ye û ev şer Kurdan aciz dike û wan bê hêvî dike. Lê ji bo nan kes nareve. Gelek kes hene nanê wan yê rojane nîne, lê dîsa ji Kurdistanê demakevin. Yanî azadî li ser her tiştî ye.

Em dikarin bêjin asoyê Kurdistanê gelek ronî ye, ne îro dê sibê, ne sibê dê salekê din jî be ne ambargo wilo dimîne, ne jî rewş wilo dom dike; dê çareyek bê dîtin.

Ku hûn salekê din bînin li vir em dê wê gavê bahs bikin par weha bû, isal rewşa me weha ye.

Armanç: Butçeyên Partî û Yekîtiyê ji ya hukûmetê pirtir in, ev çawa dibe hûn di vî warî de çi difikirin?

D. Şêxnûrî: Ne pereyên wan pirtir in, ne jî yê me hindik e. Em ji ciyekî pereyan peyde dikin, mesela gumrukê ew di bin destê hukûmetê de be kes jî hukûmetê dewlemendtir nabe. Heta berî çend mehyan me alîkariya hizban dikir. Wextêkî Beryê Kurdistanî ev karî dikir, wexta hukûmetê çêbû ev kar ket ser milê hukûmetê.

Hevpeyvîn

Firat Cewerî:

"Di gelek waran de em tunene"

Bi pêşniyara Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, bi navê "Proja Behra Reş" di navbera 14 û 23'ê Çiriya Paşin de gerek çêbû. Ji gelek welatên cihanê gelek nivîskar beşdarê vê gerê bûn. Ji Swêdê Mehmet Uzun û Firat Cewerî û ji Rûsyayê jî Ordîxanê Celîl wek nivîskarên Kurd beşdarî gerê bûn. Li ser gerê hevalê me S. Rêving bi Firat Cewerî re peyivî



Firat Cewerî

kirina rêxistineke nivîskarên Kurd beşek e ji xebata avakirina dezgehên netewî. Bê guman rêxistineke nivîskaran wê ne partiyeke siyasî be. Wê li gor întereseya endamên xwe xwedî destûreke taybetî be. Lê eger protestokirina dewletekê jî pêwîst be, dikare ew bixwe li ser biryarê bide. Lê min bersiva pirsê xwe bi tememî negirt.

Firat Cewerî: Wek min got gelekî baş e û pêwîst e. Lê em bibêjin Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, gava yek bixwaze bibe endam, yek ji şertan ew e ku du pirtûkên wî yê bi kalîte çap bûyîbin. Bispore wan hene, dixwînin, biryar din. Lê ji bo Kurdan şertekî weha nabe.

Armanç: Di 27'ê meha 11 li Stokholmê bi beşdariya piraniya nivîskarên Kurdên bakur li ser avakirina rêxistineke nivîskarên Kurd civînek çêbû. Hatibû gotin ku Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê ya berê ji ber bêimkaniyetan û ji ber lîxwedî derneketina nivîskarên Kurd yê li Swêdê hilweşiya. Berî ku ez pirsê xwe bikim, dixwazim bizanim, tu endamê vê yekîtiya nivîskarên Kurd li Swêdê bûyî?

Firat Cewerî: Na... ez ne endam bûm. Gava ku ev yekîtiyê ava bû, haya min jê tunebû, mîna ku haya gelek hevalên din jî jê tunebû. Însiyatîfek baş bû. Haya min jê hebûya, beşdar bibûma mînkune... ne mînkune, diviyabû tiştê ji destê min bihata, min bikara- Lê hin heval dibêjin, name hatiye şandin, namên ku hatine şandin wînda bûne di postexanê de yan tiştê bûye. Lê wek min got însiyatîfek baş bû. Her çiqas ez ne endam bûm jî, lê dilê min jî bo wê lîdixist. Û ezê bibûma endam jî. Tam min xwe amade kiribû ku ez bibim endam, feşkilî.

Armanç: Di civînê de komisyonek hat hilbijartin. Ev komîsyon wê hijmara kesên ku civîneke duyem bibin, firehtir bikin û biryar hatdan ku bikaribin bi hin pêşniyaran konkret bin civînê. Niyeta te heye ku tu wek nivîskarekî di bin însiyatîfa wê komîsyonê de ji bo danîna rêxistineke nivîskarên Kurd li Swêdê aktif kar bikî.

Firat Cewerî: Di civîna pêşî de min bi xwe ji dîwanê pirsî. Gelo berî ku em yeke din ava bikin, ya berê çima bi ser neket? Ji ber ku piraniya hevalên ku beşdar bûn, endamê wê yekîtiyê bûn. Helbet pîrsek dizî. Bo çî ya pêşî bi ser neket, bo çî ya duyem bi ser keve? Lê mirov dikare bibêje ku şert hatine guhertin, piştî bi ser neket mirov poşman bû. Diyar bû hin tiştên baştir bihatana kirin. Di hundirê vê demê de jî li wan tiştan hatibe fikirandin. Her weha tiştên ku di ya yekê de ne hatine kirin, di ya duyem de bêne kirin. Lê belê tiştê min fam kir gelek kes dixwazin ava bibe lê kesê ku xwe bide ber tuneye.

weha. Yanî endambûn divê fêdeyekê bigihîne nivîskaran. Lê ya Kurdan nivîskar dikeve bin barekî gelekî giran. Mumkin e ku êdî wext nebîne ku bi nivîskariya xwe jî mujil bibe. Mecbûr e heşt saetan kar bike. Çend saet bimînin jî ku mal û zarok jî hebî, îcar belkî dikare çend rêzan di nav re binivîsîne. Lê belê barekî gelekî giran e. Yek ev, a din jî yekîtiyeke nivîskarên Kurd hebû. Li Swêdê. Kovarek jî derdixistin. Tiştê ez dizanim nêzîkî 30-40 endamên wê jî hebûn. Lê berî demê ev yekîtiyê nema. Kovar jî rawestiya. Nuha xebateke nuh heye ku ji nuh ve ava bikin. Hat gotin ku çima em weha bela wela ne, bo çî yekîtiyek ji nuh ve ava nabe? Lê çî bû? Yek jê tenê Kurdên Tirkiyê ban kiribûn. Wek sedema biserneketina yekîtiya berê hin kesan digotin Soran bi

To The President of Turkey,
Suleyman Demirel
and the Prime Minister of Turkish Government,
Tansu Ciller

With great worries we follow the news about the situation of the Kurdish people in Turkey.

We believe that in Turkey the Kurdish people, as all other peoples and minority groups, has the right to live with their identity, their culture and their language in peace.

We kindly ask you to do your best and find a humane solution for the Kurdish question and to secure their culture and individual rights.

Your respectfully and sincerely,

Peter Carman President of the Swedish Writers' Union	Thanassis Valtinos The Writers' Union in Greece	Benkt-Erik Hedén Vicepresident of the Swedish Writers' Union
Uwe Friesel Baltic Writers' Council	Sami Michael The Writers' Union in Israel	Mikhail Choulaik President of the Writers' Union from St. Petersburg, Russia
Andrei Burac Secretary of Moldavian PEN Club	Yuri Pokalchuk The Writers' Union of Ukraine	Laurentiu Ullici President of the Writers' Union from Romania
Rumen Leonidov The Free Poetry Society in Bulgaria	Suat Karantay The Turkish PEN Club	

İzmir, November 21, 1994

disiplîn dixebitîn, lê Kurmanc nedihat. Tişt, miştên weha digotin ku nuha jî ez nîzanim çima hilweşiyaye.

Lê nuha eger meytê yekê li erdê be, mirov rabe yeke din ava bike, mumkin e ku ne realist be. Gava ya duyem jî bi ser nekeve, ya siyem yekcar zehmet dibe. Helbet organizasyone nivîskaran hebe- li derveyî siyasetan baş e. Lê bi rastî jî divê ew serbixwe be, ji partî û rêxistinên Kurdan. Ne bi meneya li dijî partiyên be, lê her tim hevdû temem bikin. Mumkin e organizasyoneke weha bikaribe di navbera em bêjin, partî û rêxistinên Kurdan û dewleta Tirkî de jî bike, eger daxwaz ne serxwebûn be, mafên demokratîk be.

Armanç: Çi bi navê yekîtiya nivîskaran, çî bi navekî din, ava-

Armanç: Hûn li çend welatan geriyar?

Firat Cewerî: Ji Swêdê em çûn Atînyê. Em ji Y.N.S. hin enstîtu û dezgehên 80 kes bûn. Cihê hevdişîna pêşî Atîna bû. Em çûn Ukranyayê, Romanya, Bulgarîstan Li Tirkiyê jî em çûn Îstênbûl û Îzmîrê. Me muzexane û eserên dîrokî yê wan welatan dîtin.

Armanç: Li ser mesela Kurdan, edeba Kurdî yan zimanê Kurdî hat peyivîn?

Firat Cewerî: Gava ku problemên etnik dihat ziman bêyî ku behsa Kurda bête kirin, nav derbas nedibû, ji ber ku yek jê welatên ku em çêbûne-Tirkiyê- problema Kurda lê hebû. Lê di gemiyê de pîrsa Kurdan hem di programê de hebû, hem jî li derveyî programê, hintişt hatin kirin nezi 10 NY welatên cihê nameyek bi Îngilîzî ji Serokomarê Tirkiyê Suleyman Demirel û Serokwezîra Tirkiyê Tansu Çiller re û ji bo ku ew hebûna gelê Kurd qebûl bikin û bi awayek demokratîk çareser bikin, ji gemiyê bi faksê ev name ji wan re hat şandin.

Armanç: Mirov dibîne ew nivîskarên Kurd yê ku li Ewropayê dijîn, bi piraniya dibin endamên Yekîtiya Nivîskaran yan jî PEN ên welatên ku lê dijîn, bi aktîfî kar dikin, aktivîteyên wan pir in, heta dibin endamên Komîteya Karger yan organên xwedî selehîyet û biryar. Lê ew aktîf bûn, ev germî ji bo nimûne ji bo avakirina Yekîtiya Nivîskarên Kurd li ba wan nivîskarên Kurd tuneye. dem û westana xwe nadin avakirin, yan berdewamiya rêxistineke nivîskarên Kurd. Çima?

Firat Cewerî: Nuha...Li welatên xwedî dewlet gava ku...em bêjin li welatên demokratîk yekîtiya nivîskaran, sendikayên nivîskaran li mafên endamên xwe dipirse, li dîv mafên wan digere. Wan li hember dewletê biparêze. Gava li hundir û li derve tiştê hat serê wan, wan biparêze. Yanî li van welatan menfeatê nivîskar di endametiya yekîtiya nivîskaran de heye. Mesele Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, belkî zêdetir ji 2000 endamên wê hene. Ev ne ji bo ku problemên civaka Swêdê çareser bikin, hatine ba hev. Ne tevgerêke îdeolojîk e. Lê ji bo Kurdan... Yanî yekî-tiyeke nivîskarên Kurdan ava bibe jî problemên wê, barê wê gelek giran e. Ev yekîtiyê wê nikaribe problemên xwe û nivîskaran dakeve. Divê hin berpirsiyariyên vê yekîtiyê hebî. Ew jî çî ne? Îro welatê me kaviyê dibe, girov wêran dibin, koçberî heye, mirovên me tîstî kuştin. Divê ev yekîtiyê temaşevan nemîne. Yek jê ew e ku ev yekîtiyê bikaribe her tim dengê xwe bilind bike. Ev

Ji Gernameya MARCO POLO 7 Li Asyayê

Wergêr ji Swêdê: Mihemed Behlîwar

Welatên Îranê-II-

Hinek ji xelqê çend cihên vê heremê hov in û ji xwîn rijandinê hez-dikin, wek kêfxweşiyekê hev birîndar dikin û hev dikujin. Ger ne ji tîrsa padişahê rojhilatê bûna -ku qanûnên wan jî ji vî awayî ve gelek hişk bûn-, dê van kesan zaftir xirabîyan bianîna serê tacir û rêwingiyên ku di vir de diçûn û dihatin. Qanûnên wisan hatibûn çêkirinê ku rêwingî di kîjan rîyê de biçûna, ger meriv ji tiştê wisan bitirsîya, xelkê wê heremê li ser daxwaza taciran mecbûr bûn ku ji heremê heta heremek din jî bo parastina wan û rênîşandana wan merivên emîn û bi bawer tîxistinê emrê wan. Heqê wê jî li gora dîrbûna rê û her serê barekî dihat sitandin. Ewana alîgirên ola Mihemed in.

Li bajarên tacir û bê hesab senetkar hene ku bi koman cawên ji zêr û hevrişim çêdikin. Li vê heremê pembû û her wiha genim, ceh û hibûbatên din gelek baş digîjin. Şerab û cure cure fêkî jî bê hesab in. Belkî tê gotin ku Saracenî ji ber ku di ola wan de qedexeye şerabê venaxwin, lê dema ku ew vedixwin jî wîjandê xwe wiha rihet dikin: Ew xwe xwe îqna dikin ku dema ew şerabê dikelînin, bi awayekî wiha dikelînin ku şerab pir hêdî û bi agirek hindik dikele, ji wê beşek dibe buxar û şerab şêrin dibe. Hingê ew karin vê şerabê vexwin bêyî ku ew qanûnên vê qedexebûnê bipercîqînin. Bi guhartina tama wê, ew navê wê jî diguhrînin û jê re nabêjin şerab, lê di eslê xwe de ew eynî tişt e.

Yasî (Yezd) bajerekî giring e ku dikeve hidûdê Îranê û ticareteke mezin tê de çêdibe. Li virê cureyek cawê hevrişim bi navê Yezd tê hazîrkirinê û bi alîkarîya taciran ji vir tê şandin hemû deverên dinyê. Gelê vir ola Mihemed diparêzin. Kesên ku ji vî bajarî bi rê dikevin, lazim e ku di rasteke nêzî heşt rojan -ku tenê sê cihên xwarin û razanê hene- bimeşin. Rê di nav daristanên ji darên xurmeyan ên fireh û di nav cure cure heywanên kovî û heywanên qepikê (mirîşk, dîk, elok...) de diçû. Ew kesên di vê rê de diçûn û dixwazin neçîrê bikin, karin li virê bi dilê xwe neçîrê bikin. Her wiha kerên kovî jî peyda dibin li vir. Piştî rêveçûna heşt rojan meriv digîje qalîyeta Kerman.

Kerman qraliyeteke ku dikeve aliyê rojhilatê tixûbê Îranê. Berê ev der ji aliyê mirên Kermanîyan dihat îdarekirin û mirantî jî li gora azbatê domdikir, lê piştî ku ew der kete destê Tataran, ewana li gora walîyên li gora dilên xwe dianîn ser hikum. Di nav çiyayên vî welatî de kevîrên bi qîmet hene ku em ji wan re turkos (feyrûzeyî) dibêjin. Li virê damarên madenên hesin û andanîcum (38) ên pir zengin hene. Li vî welatî tiştên şervaniyê wek zîn, haletên wê, şûr, tîr û kevan, qutiyên tîran û her wiha hemû çekên şer ku xelq dixebitîne bi hostetî tê çêkirin û hazîrkirin.

Qiz û jinên ciwan karên nexşan dikin û di vî karî de ji cure cure rengan zêr û hevrişim nexş dikin. Di van nexşên xwe de gelek mestereyên hemû şiklên heywanan û şiklên din ên xweşik çêdikin. Ew bi hostetî û heyranî ji bo lihêf û balîvên di nav livînen maldaran dihatin çêkirin û bikaranîn. Li çiyayên teyrên baz ên herî esîl peyda dibin ku ji cîhekî difirîyan û bi baskên xwe bi hewa diketin diçûn cîhekî din. Ew ji teyrên baz ên gerokê hûrtir in, sing, gewde û bin dîvên wan sor in û fira wan wisa zûye ku ti çivîkî nikarin ji ber wan rizgaribin.

Çaxê meriv ji Kerman xelasdibe, meriv gera heşt rojan di rîyên xweş de derbasdike û li ser rîya xwe di rastîyekê de kew û heywanên kovî dibîne. Û Meriv rastî gelek bajar, koşk û seray û avahiyên belewela dihat ku çaxê meriv dihat dawîya berjêreke, ew jî du rojan berdewam dikir. Li wirê bê hesab darên fêkiyan hene. Xaniyên heremê pir nêzî hev hatine avakirin ku niha ji xelqê vala ye. Meriv tenê şivanên ku şivaniye pezên xwe dikirin didit. Di vî beşê welatê de ku meriv tê de derbasdibe, berî ku meriv were berjêr sermayek wisa heye ku meriv ancax bi gelek cil û cilê bi kurk karibe xwe li hember vê sermayê biparêze. (39)

Piştî meriv wê berjêra ku me di jor de bas kiribû derbas dike, meriv tê ser rasteke ku bi aliyê başûr ve pênc rojan berdewam dike. Berî destpêka vî cihî bajerek bi navê Kamandu (40) heye. Ev bajar berê bajerekî mezin û giring bû. Lê niha ji ber ku ji aliyê Tataran ve hatibû xirakirin û wêrankirinê ne cîhekî zêde giring e. Ji herema wirê ya coxrafîk re Reobarle (41) tê gotin. Hêwaya vê heremê gelek germ e û ji ber wê jî genim, birinc û toximên din li wir baş digîjin. Li beşa nêzî giran darê hinaran, ên sêvan û fêkiyên din çêdibin, her wiha şikleke sêvê jî ku jê re sêva Adem (42) dibêjin ku ji hêwaya aliyê me re gelek xerîb e. Li virê bê hejmar û bê hesab kevok hene. Sebebê wê jî ew e ku li virê gelek fêkî û berên piçûk û xweş peyda dibin û ji aliyê din ve jî Mihemedî wan nakujin û goştê wan naxwin û bêdaxwaz wan di hewînin. Her wiha li virê pir tîtav (mirîşkên dûvmîsas) û frankolîn (durac?) jî peyda dibin ku naşibin yê welatên din. Rengên wan sor û sipî ne û nikulên wan û pepikên wan sor in.

Têbînî:

38) Andanîcum şikleki hesin e.

39) Destnivîsên Toledo dida xuyakirin ku xelqê Kerman baş in û xwedan alîkarî ne, lê xelqê faris û bi taybetî yê Îsfahan xerab û xêmexwaz in. (...)

40) Ahmadi niha gundekî di nava Hurmîz û Kermanshahê de ye.

41) Bi vî navê Rudbar tê qest kirin ku li virê gelek çem û rûbar hene. Ew dikeve navbera Kermanshahê û Hurmîzê.

42) Li gorî Yule ev şikleki limonê ye lê meriv nizane çî texlîd e.

Dûmahîk heye

Çand û wêje

Kewbazê kerr û dengvedana dijwar a bazinên Taristanê

(Li vir berbang di rengê xweliyê de ye, hergav ne wilo bû, em nizanin em dê kê gunehbar bikin .."HINRI MIŞO")

U min jî digot:
Şagirtê çolistan û babelîsk û xaniyên nizam yên mişt çirok û dastan û serpêhatî; tarmayî û dilmayî, bû ... Guldank û gulşenan ji rengvedana awirên şeyda hez dikirin, Balendeyan, hehecikên revend û westiyayî di qubên dilê wî de hêlinên xwe bi şarezayîya nikulan dineqîşandin...Radestî çive çiva şepal û pirtepirta pêrikên dilovan dibe. Bê xwe, dimîne. Xwe di nav reşî û tevan xewnê de dibîne. Wek kemendekê, Tembûrêkê hinavên wî dagîr dikir...Koşeyên bêdengiya wî hildibûn, mû bi mû, reh bi reh, şev dişewitî, lê keleha dengê wî, çirên giyanê wî, esmanê ku her û her li tenîştê wî xaçkirî dijî, ha ji xwe hebûn... Di nav pencên YOTOPYA tal de li sedemên hiriftina tava heyvê û li çiyetiya têramandin û hişmandiya mêkewan dipirsî. Ji dest xwe nedîçû. Dem pêlîpêl e, lewra, hemreh û neviyê mêtina serdeman e.. Xewna balhilgir, giran, pare pare di nav nermika destê wî de diqermeçe, berya ku pirs di qirîkê de biqurmeçe, çend qurtên cegerdaryê bi ser xwe de dadike, tiliyên xwe dialêse, çavên xwe yên şêrîn û windayî wek pergarekê vedike û ji Tembûrê dipirse:

- Kê ev kîna rûtirş li ser koda te kolandiyê?
- Kê têla te bi herikîna ve birinê şidandiyê?
- Kê ev ziyar li zend û perda nazik pêçandiyê?
- Kê ev xencera jehramêz di piştê stiranê de çikan-diye?
- Kê kila pijankên te, newaya mizgîniyên te, kê keskesora eniya te revandiyê?

Bi parzûnka awazên ziman jêkirî, tava şiniyên xwe yên çeleng û pakdar diparzinîne... Berê xwe dide terribûna guliyên berfa sor ya ku ji ber devê çiyân mabû, xwe bi şilêran, bi henasa teraş û şikêran, bi mîja kental û car û nizaran, li pêşberî stêrka karwanan û westana kakêşan, xwe bi firişte û perwîna dilê LALEŞ radipêçe....

Dema ku bi şûr û martalê xwe, bi kum û kolazê xwe, bi çemê bêrikirinê ku ji nav çengê wî diherikî, dema ku singê xwe di gerdana xînorê SERHED de diçikand û axîna axê bi dil guvaştin derbas dikir...., ji lîlav û bîna ewrên bazdayî, ji xişexîşa bazinên rizyayî, ji perenga bê tîn mayî, îşkence û rêsgirêdan û pençeyên kûrekûra "ŞENGAL" nasdikir...., Bi tîrêjên roavahiyê destnimêj digirt, zikê çiyân didiqdiqand, termê bîranan li ber seqema hişê xwe dirikrikand..

Lê di hingavtina xwînê de, Tembûr dibe keleka westanê...
Suxteyê heyheya dijwar xwe bernade ji himbêza wê

meysanê..

Li ser berdan wek comerdan diparêze bend û xêzên wê peymanê..

Xwe nabêje semarêje xwe bernade ji serkêşiya vê dilanê..

Bi dilê bihokan vedide û bi ser de xwe dispêre nemanê..

Dema ku tu li ser keviya bêcir, keviya lajewerdî ya tembiya karwanê bê qublename pêrgî tûjahiya dengê BAVÊ TÛJO dibûyî, Tembûra te ji dil digiriya...

Tu xwe daqûl dikî daku sirra bayê kurr û sira hevokên beravêtî / gemkirî, nehingivin çermê nalîna te yî çekur:

-Di van çiyayên bê bext û xewnkuj de tu çawan li gavên xwe ewle dibî?

-Tu kî yî?

- Anuha xwînî me di pê re sosret û şînî me .. Her ku ez tîm bobelatekê dizêm.

-Û çiya?

-Ji ber min çû. Zû bi zû bû dî xwe sipart dilpaqijîya giya..

- Ne ez im ê ku li giya ewle dibe. Lê tava heyvê bi milê min vedida. Min jî wek te, ji heyva çardeşevî hez dikir, li ber devê sêdarê zimanê min nedigerîya ku xatir ji rondikên narincî bixwazin..

-Na BAVÊ TÛJO. Rondikên herî dilsojane yên Tembûrê ne?

-Û yên dayîka min in jî ... Wê êvarê saw û metîrsî di dara giyanê wê de dibîşkiyîn, kela girî di qirîkê de, lêv zuha û ziman girêdayî, bi berzûriyê ku ji kezêba wê der diçû, xwe davêt bextê Xwedê, pêxember û ûcaxan..

Lê tu kesî guh neda dûkela wê.

Hema min careke di herdû çavên tî bi maçekê av bidana...

-Hema min careke di herdû werdekên GOLA WANÊ ji gerzela singa wî berdana...

-Hema careke di çirokek cinnan ji min bibihista...

-Hema careke di bi ser rûreşiya gerdûn de bimista...

-Hema careke di bihata û bi morikên gerdeniya min bilista...

Nimej bi dû minjê de, dil dikelîya, tirs dimeyîya, taristan bi ser hêviya dayîka min de hat xwar. Dîsa heyvê xwe kir kevîrê ber dilê wê.

-Û lêwlebûn BAVÊ TÛJO?

-Ez û kevokên bejî di yek şikeftê de fêrî bayê ber tavê bûbûn.. Min digot welat hêlîn e, kevokê digot hêlîn zindan e. Min digot jiyan evîn e, kevokê digot evîn mirin e. Min digot berbang derman e, kevokê digot derman ziyar e. Îca wek xemgîniyek xweşik ji xwe derçûm, rûyê min nêzîkî roavahiyê bû, bîna tûtînê û toza bajarên biyanî ez ji dest hilanîn dixistim... Min peyvên jiyanê bêjing dikirin û di pêkenîna

◆ Ehmed Huseynî



pêşin de min hezar wateyên perşikestî ji boyî rençkêşana xwe yî ebedî diafirandin..

Min mirina xwe li ser bergên goristaneke mezin, min termekî bêkutayî û tenhatiyêke bê mînak, durust dikirin.

-Demek tu li kevokê ewle bûyî?

-Wê subehê, li ser serê baskên xwe, bi çavine mişt xwîn, ji şikeftê ber bi asoyekî birindar de, derçû... Pişt re min di koşeyek tarî de bîranînen xwe veşartin. Bi lerza boşekê û bi birçibûna pilîngêkî û bi sergêjahiya evîndarekî çayî min êrişî tava heyvê ya ku li ber dergehê şikeftê çav qerimî mabû, kir...û tu??

-EEEEEEEEEEEEEEZ?

... Bi tenê. Wek lehengekî bêpar ku dîroka jeografya şîniya xwe di xirecira demê de û di tevliheviya şûnwaran de wendakiribe...

Min jî... gerdûn ji kevilan rût dikir, bi giyanê xeloxavî min wêrana ber beyaniyê dimaland û min bajarên dirandane bi sixêf û çêran, bi ferhengên koçbarî û tenhatiyê dorpêç dikirin..

Ji terkên hinarkên elandê dipijiqîm û di çelmisîna xewnê de bi cî dibûm.. di kolanên bîra gundan de hînî xatirxwestina şehîdan û mirina dostan dibûm. Ez nizamim çend serdeman li jêr siya şengebiya talankirî, dirêjkirî û li ber êrişa toza destpak, bê hiş, mabûm.

Sozê me nedihat û keştiyan melevanî ji bîr kiribûn.. Min gencîneya canê xwe dispart taristana sermedî û min bi destê poşmaniye silavên xwe li hezar bêrikirinî dikirin..

Çav diçelmisî û pirs dúbare dibû:

Em, dündeyên vê nijada kurdünde, em dê çawên bikaribin xwe bavêje rexê dîtir?

Rexê ku mirî bi bêdengiyêke tûj şevbuhêrkên xwe, serdan û pêkenînen xwe, bi pîvanên bendemanê diedilînin... ku peyala seqem û berfa reş bi noşî veduxwin...

Tu li wir î, tu di helkehelka qonaxê de yî, tu di nav sîberan de têt bişavtin. Dilopên xwîna te çavkaniyên qerisî sermest dikirin, zemîn jî bi hêsiyên te dinemiya, şil dibû, kul dibû, digiriya..

Dûmahîk heye

Hunermendê Kurd Înayet Etar "Rojhilat ne hema Ereba û Misilman in"

Pirs: Ma gelo hêjî tu xwe wek hunermendekî realist dibînî, tu dikarî xwe biparêzî?

Bersiv: Ez ne gunehbar im da ku xwe biparêzim, çinkî realîstiya min hem xizmeta doza gelê min û hem jî xizmeta Kurdayetiya min dike. Herweha di hunerê de realîstî ne kêmasî ye. Dawî jî dema ez berhemekê diafirînim, aferandina wê berhemê bi hêsanî, ne ku bi kotekî li cem min pêk tê. Rojekê ji rojan ez li ser dibistanekê nehatime hejmartin.

Pirs: Hergav tu Kurdayatiya xwe nişan didî. Ma gelo li vir Kurdayetî wek nasnameyê dixuye yan jî wek beşeke ji seqaya rojhilat ku tu bi xwe lê jiyayî û dijî?

Bersiv: Madem ê hesinkar dev ji karê xwe berdide û direve çiyê. Madem ê mamoste dev ji dersxanê berdide û pîre dayîka xwe li ser milê xwe dike û di bin gullebaranê de berê xwe dide nêzîktirîn şikeftê. Madam ê evîndar dîlbera xwe winda dike. Madam...û, îca çawan ê hunermend dikare bêalî be? Çawan tu dikarî ji rewşenbîrê Kurd bixwazî ku xwe di sergerînokê re çem bike di wê wexta ku ew bi xwe di nav wê de ye. Em dê çawan bikaribin Gaza Xerdelê ya Helepçeyê bi gulavên Parîsê biguherînin?

Hevalo, min dixwest ku ev pirs ji ber xwe ve ji herikîna hevpeyvîna me derbiçûya, çinkî tiştên berbiçav pêwîstî guftûgoyê nakin.

Lê bi nisbetî seqaya Rojhilatî, ma kê gotiye ku Rojhilat tenê Ereba û Misilman in? Wek ku Îranî, Tirkî û Berberî û Himdî û Efrîqî hen in, wilo jî rojhilatîya mirovê Kurd bi çarçewa xwe yî giştî û bi ya taybetî heye. Ligel beşdariya dîrokî ya Kurdan di avakirina şaristanyên Rojhilat de.

Pirs: Anuha tu bi kuderê ve diçî, piştî van salan tu çî ji tabloyê dixwazî?

Bersiv: Bêyî pironame ez ber bi evîna de diçim. Lê ez çî ji tabloyê dixwazim ev bare(hale) bê kutayî ye. Çinkî berdewamiya min bi ronîkirinê û bi ezmûneyê ve girêdayîye. Lê bêguman jiyanê Parîsê, mij, kes û muzexaneyên wê û durbûna wê ji wêneya Dayîka min de şûnşopa xwe bihêlin.

Pirs: Rengên te, di çarçewa xwe yî giştî de, germ in û rojhilatî ne. Li vir çawan tu dikarî xwe ji hesta xemilandinê rizgar bikî, ango tu hest nakî ku reng e carcaran xemilandin te dil bike?

Bersiv: Îro roj rola xemilandinê nemaye. Çinkî spehîbûn wek regez aferandine bo xwe-yîya mirovatîyê (cihanek



xweşiktir bidin min) dibe cîgirê(cihanek dadmend bidin min) ku bi hezaran car hatiye gotin. Bi vî awayî mirov jî îdeolojiya jî derdikeve, îdeolojiyên ku dawîya wan tîkçûn û herifin bû çinkî ta anuha siyasetmendan nikaribûn wêneyek spehî bo jiyanê nîgar bikirana. Lê ez, wek kesekî Rojhilatî ku ji ronahiya tûj û ji rengan di pileyên zelal de hez dike. ev bi xwe ji ber perwerdekirin û cîgehê jî dayikbûna min tê..Ne bi destê min e û tu carî jî di bikaranîna van rengan de dudil nabim, berevajî wê, xwebaweriyê li ba min kurtir dike, lewra ez dibînim ku, tu carî jî min nayê xwestin ku ez nasnameya xwe biguherim.

Amedekar: Cemil Hetmel

Birûska cavlixew

Awirên çavên te Helbestek ne jîbirkiriye, dema windadibin..
Benefşek "asoyekî vekirî" bê cografya dilorîne, benc dike..
Xunavê kenê te, evîna min, gemyanek kesê dihûne.
Gelo: Piştîyên derdan barê te ne? De were, were, ezê lê bigerim lê ê ê.
Çend pirsên min şevdar mane.
Ji vê bêrikirina xwe, jîbirkirinê didrûn.
Helbesta min hilma gul, xwîn, av, jê difûre.
Evîndarê min: "Du kehîni li ber te ne" eger pirsên me bi lîsekî şa nebin,
Dem.. ewê dem bibe gopalekî çeloxwarî.
Û hêsiyê agirînekî har e Ji keseran, dixele. vî alî, wî alî..

Tengezarê Marîni

Ez dixwazim li ser çend pirsên rêzimanî,hevokî(frazio-logî) û romanî, di çanda Kurdî de, rawestim. û, weku nimûne, berhemên rojnamevan, nivîskar û romanvanê Kurd M. Uzun werbêj bikim. Lê, ka ceger !?

Ha...ha, da ez xwe ji bîr nekim û we, bi wext, agadar bikim, ez ji we bihêvîme, ku hûn bihna xwe li min fereh bikin û zû bi zû doza ronîkirina van pirsan li min nekin, baş e !?

Dêmek, emê, bi hev re, bidin ser rê û gava pêşî bavêjin.Lê, divê em tiştekî ji bîr nekin, ku ez newêrek im.

Belê, heval û hogirên min tev, min bi bêziravî dinasin. Loma, gava van pirsan dadixin meydanê û didin rûyê min, xwihdaneke sar, ji şerm û fedîyan, min digre. Pêre-pêre sermexwîn dibim, lebt û livandin ji min çênabin, lêvên min zîz dibin, gotin, di hişê min de- eger hebe!-, tevî hev dibin. Hinga taqeta min û bersivê namîne. Ez, di vê rewşê de, bi cegerê xwe mijûl dibim-Dêmek, raste, ez bêzirav û tirsonekim. Ev ji dana xwedê ye, ma ez çi bikim!!.. Ez ji kirasê xwe derkevîm!!.. Na, dilê min xweş dibe, gava bersivên hin dostan xwe li perda guhê min dixin û, bi xurtî, xwe didin pêş, dibêjin: " Ev nivîskar kesên bajaran in...Di civaka Kurdî de ne rabûne,loma nêr û mê ji hev nasakin, hevokên rast û durist avanakin, piş û pesn û xisletên Kurdan, ji yên biyaniyan, cênakin..."

Ez di bextê we de me, ma ev bersivê!?.. Kirî, min bi vê bersivê re zuxurkê bin zimanê xwe pû bikira...Lê, divê bihna me fereh be- " **Xwedî sebrê, melekê Mesrê**".

Belê, ji dil dixwazim çend pirsên bi berhemên mamoste M.Uzun ve girêdayî berçav bikim. Lê ez çi bikim, û çawa dest pê bikim?. Navtêdan têra min nake, ku ya dilê xwe bibêjim, ku van kul û keseran, ji ser dilê xwe û we, bidim alî.

Xwe ragirin...Min nas kir. Dêmek, gereke ez hêdî-hêdî nav di xwe bidim, da wêribim destbavêjim berhemên mamostayê bi nav û deng- M.Uzun.

Belê, dibêjin ku, jinekê, heft şev û heft rojan şerê Restemê Zalê kir,wî ji ti çiv tê nedîn. Dawî, nav di xwe da- navê xwe hilda. Jinik, bi bihîstina nav re, ji tirsê, ji hespê xwe de hate xwar. Ma kî kare, xwe li ber vî navê mezin û gewre ragire!?

Binêrin, bê çawa ez tirsonekim!. Min, ji tirsê, peyva "mamoste" bi kar anî. Ma ne ev peyv, di Kurdîde, li gor bîr û behweriyên min, peyveke dumile, ji du peyvên saltgir pêk hatiye- "Mam" û "Hosta". "Mam", ji pesneke ji wî kesê jîr û zana re, ji wî kesê ku qezencên jiyani, di warê civakî û zanîstî de, ji dewr û zemanên xwe, kirine, û wan bi kar tîne. "Hosta", jî pesnê wî kesê destzêrîne, ew kesê ku, weke Kurd dibêjin,"hesin di destan de dibe şima", pesnê wî kesê "hevkar"ye. Dêmek, "mamoste", ew kesê ku her karî, bi duristî, zanibe pêk bîne, û bi hûrbîni bineqîşîne.

Bi vê yekê, em dighin pirsaxwe. Pirs ji eve: "Gelo, romanvanê me dikeve bin siha vî konî, ku em nişana" pê ve bikin?. Bersif jî: Ka em binêrin.

Herê, hûn xweş dibînin, ku ez newêrekim, nikarim gotina xwe rastûrê bibêjim. Loma, weku ro-vîkî kuhne xapan didim xwe- li min negrin, nav girane!

Hûn, bixwazin, nexwazin, bi min re ketin ser rê. Lê ez, weku "axayê çav-sor", nav di xwe didim, bê ku kesekî min re bibêje: "Çavên te sor bûne", da ez xwe tê werkim. Min jî, weku gelek xwendevanan,"cilika bêna..kişandîye serê xwe!".Bêziravî, xwe sed carî bêziravî!. Ma, ev yek ji minve maye!?!: Kurd dibêjin:" Qelso, emir dirêjo!"..Ka gunehê min, vêce ciye?!.. U tiştek ji melaqiyê hesanîtir nîne, ji ber pêşiyên me dişe gotine:" Welaqa buhar xwar, melaqa dinya xwar". Ma, em dinya xwe, bi melaqî bixwin, ne çêtire?. Na,ji ber ku pariyê parsê di ber herkesî de naçe xwar!

De, ka ezê emrê xwe kin bikin, yê we dirêj bikim, û cegerê xwe xurt bikim, nav di xwe bidim, hêrizen xwe tevrakim û gotina xwe bibêjim-" xwe tê werkim"...We go, çi?. Na bavo!. Na, " min nan bi guhên xwe ne xwarîye" û " ez ne çûkê davkên kesî

Bi "Elim"

Rezo

me!", ku xwe bavêjim nav êgir, ku xwe tîxim nav perengên tenûr û koziyên dadayî. Na, ez xwe naxim devên şût, nav dinanên sûtî.. ma ev gotin ji min ve maye!?!- serê ne êşe, ne gerkî girêdanê ye !". Ma serê min, ji van pirsan, têşe?. Na...

U da em serê hev, behtir, ne êşnin, ezê serpehatiya "Çavso-riya axê", ji we re, bêjim... belkî pêre-pêre çavên we ji sor bibin û hinek berî min " xwe di çalê werkin". Çirok jî, bi kurtî, wilo ye: Talanbiran li terş û talanên gundekî dan. Şervaniyên gund, pêvî axê û xulamê wî, pey talanên xwe ketin... şer giran bû. Axê got xulamê xwe:" Kuro, ku çavên min sor bûn, ji min re bêje, da ez xwe berdim meydanê û talanan vegeirînim".Wilo, axê her bihekê, pirsaxwe çavso-riya xwe dikir, lê xulam digot:" Na, hîna sor nebûne...na..na.." Tanî, carekê, ji neçariya pirsên axê, got:"Çavên te bûne du perengên berûyî bûne pizot!". Axê xwe, bi vê bersivê re, berda şer. Lê, mixabin, birîndar bû. Ew, ji garsîna şer, dîr kirin. U piştî bi hişê xwe hat, berê xwe da xulamê xwe, got:" Malmîrato, gava min xwe berda şer, hîna çavên min some bûbûn".

Na, ma xwene ez ew axayê bêhiş û nezan im!. Hûn bêjin, ne bêjin, hîn çavên min sor ne bûne. Lê, ez di xwe derdixînim, ku di nava xwe de dikelim... û dixwazim vê kela nava cerg û hinavên xwe veşikînim, lê çawa?. Ez nizanîm... ma hûn zanîn?. Na, ma kî zane, belkî "çavên we, li min, sor bûbin!". Lê ne xeme... xwe li min ragirin-"sed deriyên fercê hene!".

De, ka bihna xwe li min fereh bikin û bihêlin ez serpehatiya xwe û "Lêkolînan" û "Folklorîstê" Kurd Dr. Celilê Celilê bêjim, başe?. Piştire "hûn bi xêr û em bi silamet".

Bi kurtî, ez agadar bûm ku berê **Dr. Celilê Celil** li ba mine. Lê, demeke dirêj derbas bû, bê ku

ez wî bibînim. Min bihîst hatîye, li ku ye, bi kê re ye, li ba kê ye û çi dike. Ez jî pê şop, şûn û warên wî ne ketim. Wilo jî, min lê ne pirsî- min xwe ne bihîstî kir. Min naskir, ku camêr kesên din kesên ji min çêtir- "ber bi qefa xwe xistine". Ew kes kî bûn, ez na bêjim... ma ya min û we, çi ye?!... her balindek li refê xwe digere. Lê sût ji gotinê eve:

Rojekê di kolaneke bajêr de, em pêrgî hev hatin- ew û çend kes bûn, ez û çend kes bûn. Wî, xwe ji refê xwe ragirt, min, xwe ji refê xwe ragirt. Me bi dilsarî hev himbêz kir, hev maç kir... Min jê re got: "Dengê defê ji dîr ve xweşe!". Wî jî li min vegeand: "Rim di xêşan de wenda nabin!". Me nas kir, kî çi dixwaze bêje. Me li hev pirsî û zû- zû her yek giha refê xwe. Lê, me soza hevdiyênê dabû hev. Belê dema sozê hat, me hev dît û em ketin gîftûgoyan. Min jê pirsî:

-Tu dara folklorê nakesixîni?
-Dara folklorê tê xwedîkirin, tê guhdan, kesax, jêre negereke !!

-U şaxên hişk û ziwa?
-Çi çax !? dixwazî bibêjî "Tenûr bi tir û fisan germ nabe" şaxekî hişke!?

Na, zargotina Kurdî ji civaka Kurdî hatiye... Tenûr ji regezekî jiyani ye, alavekî rojane ye, di vê civakê de ... Destavêtina vê darê, ne tenê nedrustîke mezine, lêbelê gunehekî girane..

Min jî, bi fedîbûn, got:
-Na " Tu herî erş, tê vege-ri ser tirkê reş!" U min yek nekir dido, yeke din jî pêve kir "Kîr bi paçikan mezin nabe!"

-N...n...n... a. aaa. Tiştên wisa nayên danehev û nivîsandin... ev pêlekî zer e, wê ji ber xwe bikeve- Dr. bersiv da.

Ma xwedêkî ev gotin in!! Na... De ka rêke pêş min bikin, çawa ezê xwe ji vê gerînoka bêjeyên pûç derxim, çawa ezê xwe bi ceger bikim û vê kulê, ji ser dilê xwe û we, rakim da gotina xwe bibêjim. Ez û we, bi van gotinên pûç û kelevajî, gêj bûn, serê me

bû koda tembûrê. Lê, çara bêziravîyê nîne!! Werin, em dişa xwe, bi çiroka "Şêx" û "Sofi", mijûl bikin..belkî dergehek, ji mîrxasiyê, li ber me vebe û em tê re derbas bibin da bigihin mirada xwe.- karibin bersiva xwe, bi mîranî bidin. U nebin melaqê dinyaxwar.

Dibêjin, "mirîdan" gilihê "sofîkî" kirin û gazin, li ba "Şêx", jê kirin, gotin: "Sofi sixêfoker e, gotinzivir û xeberçort e...çarekê jê re bibîne."

"Şêx" gazî "Sofi" kir û dilsariya xwe jê re da xwiyakirin. Sofî bersiva xwe da got: " Şêxê min, ez tiştên ne di rê de bibînim, dibîhîzim, xwe nagirim... gotin ne bi destê min, ji devê min, derdikevin... "Şêx got: "Delal, zuxurkê bixe bin zimanê xwe, da gava te tiştên ne di rê de bihîstin, tu xwe ji bîr nekî, bi zuxurkê bin zimên mijûl bikî û sixêfan nekî". U zurek da Sofî. Wî jî zuxurkê xwe, bê deng, xiste bin zimanê xwe.

Wilo, yek derbasî cem Şêx bû, got : "Şêxê min, xaltîka min ne stêlehe, ez dixwazim, bi helaliya Xwedê, wê li xwe mehir bikim û hatime tu mehra me bibirî". Şêx, bi vê gotinê re, gazî Sofî kir, got " Delal, zuxurkê bin zimanê xwe bavêje".

Vêca, hûn ferman didin ku ez zuxurkê bin zimanê xwe bavêjim? Eger we erê kir, ezê jimara bê "çulîkê xwe li êş bikim" û vê pirsax giran ji ser dilê xwe û we rakim..û çi dibe bila bibe!! Lê "emanet, emanet" tiştek neçe ber dilê we û hûn bi hiş û gomanên xwe, kûr û dîr neçin. "Sûnda we li min nîne", sûnd girane!, De bi "êlim", ne ez M. Uzun dinasim, ne ew min dinase, ne min ew dîtiye, ne wî ez dîtime... ne malbatên me, ne jî êl û eşîrên me rojekê ji rojan- di bîr û baweriyên min de- şerê hev kirine, yan jî to-lên wan li ber hev hene, Eger "min tazî jî bike, ez camêr nas nakim". We bawer kir? Gereke hûn bawer bikin, eger hûn biznîbin ku "Êlim", li ba min, sûndeke pir giran e...ji her kesî re û di ber her tiştî de, ji nav lêvên" min dernakeve vê, li ba min, cihê bahwerîke mezin û asê ye. Belê, wilo behwer bin, ku tirs û destavêtina min, herdu, ne yên tolvegerandinê ne. U "eger me li êş nekir, emê jê barkin!".

-1-
Ez li bajêr gişî geriyam got, û pêrgî Tu kesî nebûm. Hey wax li min! Xelk li kûderê ne? Kulîlkên aqilê wan li kûderê xelmaş dibin? Ez ji mêrgan, ji balendeyan û ji lehiya toza bê kutayî ya di bayê pêldarê buharê de, didexisim.

-2-
Carekê min xewnek dît, di xewnê de ez dihatim odayek bendemanê, pîrejînekê pasvaniya dergehê dikir, dema ku min li sedema ji bo çi gelek derbasî odeya vala dibin ne jê dizivirin û ne jî jê derdiçin pirsî, ji min re got: "Dergehên rastîn ber bi rexekî tenê ve diçin."
Risto ahti

- 1 -
Carekê min stiranbêjekî pir xwîngerm naskir, di gelek komikan de endamekî jêhati ye: Komikên zilaman, yên tevlihev, yên yekbûyî. Ew bi xwe jî hejmara ahangên stiranbêjîyê yên ku beşdarî wan bûye nizane, pir caran em bi tenha xwe di xuristê de dimeşîyan. Hergav wexta ku em

digihîştin serê qelaçekî xweşik di got: " Xweska li vir jî ahengek stiranbêjîyê li dar keta.

- 2 -
Li IBIRDYNÊ di kolanê de likumîm - wisa eger çare nebe û pêwîst be ku ez her tiştî bibêjim- min destên xwe bi ava şêlû qirêj kirin. Mîna xwîna di filîmekî reş û sipî de dixuyan. Tu çi dibêjî eger bi rastî wisa bûya. Ne dîr bû ku ez bibim mîrkujek an qehremankî cengê ku xelat û nişan wer-girtine, reng e wek mêvanê şerêfê min vexwandana ahengê; li bajarê min BORVO, jî û kî dizane pişt re çi din jî.

Lars Hulden
- 1 -
Mirî nameyan ji hevûdû re dişînin. Fatore û raçeteyên dermanan ji hevûdû re dihinêrin.
Dayika min ji xaltîka min î pîr e nivîsand, dibêje: " Gor bi gulên ku di qûmê de çandibûn xemilandin; di gel ku sozê kulîlkekê bi min re dabûn (min ji bîr nek) ji bextê baş ez ne li

Çend nimûne ji pexşana Fîlandî

wir im." Xaltîka min bersivand, digot: " Yekcar, ji bilî ji bîrkirinê min çav li rê mana tu tiştî nedikir. Lê kesek, hê jî, bêyî bêzarî, mûmekê li ser gora min vedixîne."

Birgitta Boucht
-1-
Dema ku evîn ji ba me diçe, mala, ku ez lê rûdinê daku xanî be, tîgihîştin kûr wek şevê dimîne. Xanî pir nizim e û asîtank bilind e ta dema ku tu radibî ser xwe eniya te li binguhê bîn di-keve. Bager toza genim û baranê bi xwe re dibe. Cigare wek stêrkekê di tariyê de vedikeve. Ê min jî ji bilî westanek bi mezinbûna vê daristanê li cem min nîne. Min dît ku çawan şêtbûn rû, hinarkan û serê bêvilê dikeritûne, û çawan, cil û bergan dest bi xwe li bakirî-nê dikirin. Ez hatim da ku ji boyî çavên we ronahî û dudilîyê hilgirim. Anuha di xemgîniyê de dix-

eniqim mîna ku di mijê de kurta-nên min hînî lawiran bibin. Li kevirê ku li ser maseya min e guhdarî dikim û çawan rojên wî bi dirêjahiya xwe distirên, evîna ku ti carî de venegere vedixwîne. Xwîne dirijînim, mirov wisa ye, bi alî jiyân û dil ve mixkirî ye wek xiltê kor gerek rêça xwe di nav gelek mirinan de bimalîne.

Sirka Turkka
-1-
Ez li kêleka pencereyê rawestiyam û min dest pêkir li wê pisîka ku li pelên weryayî yên darê dinerî, temaşe kir. Mûzîkek payedar ji Radyoyê der çû û ez jî diramiyam: Wisa hemî tişt dibin dîrok.

-2-
KAMÏRE ya wî pir hestdar bû: Di wênayên wî de, herdem giyan derçûne, ligelê wî jî, xwe ji gumane azad nekir. Cara diwemîn wexta ku yek ji kuştîyan li ber kamîreyê rawestiyayî dît, ji bo

wênêkêşanê ket erê nayê, wê gavê yê leşker got: Ez dê li vir rane-westiyama eger ne zindî bûma.

Sirkka Selja
-1-
Dergehê sipî yê li vî rexê awira min her roj vedibe. Ji xwe hûn odayên ku gerek ez di wan de hejariya xwe yî rût bi cî bikim, dinasin. Carcaran dîwar min sed dil dikin, ez dest pê dikim peyvina li ser dîwêr dinivîsînim " ji mêj ve " ez dibêjim û pênûs di destê min de ye û " îro " hewldanine likumandî da ku ez li derve bim wek demê.
-2-
Bi şev, xuşexuşa daran di bagerê de, tu paldayî yî, çira min vîketiye, heftiya diwemîn e û he-man pirtûkê dixwînim, rûpel diqu-lupe lê awir li ser rûyê te radiweste, di şevên bahozane de, bê tirs, di mirinê de ramandin nabe, wexta ku ez çirê vedimirînim, bi rastî ez bi tenha xwe me.
Tyine Saastamoinen

Dimilki (Zazaki)

'ELİK Û ÇÛÇE (1)

Arêkerdox: M. LICOKİC

Tiya bî çinêbî, 'Elik û Rihe (2) bî. 'Elik xu rê gawanî keno. Cênî cê Rihe zî miyanê dew ra nanê gawanî dana harê û pê idarey xu kenê.

'Elik rocêke reyna dewaranê dew kom keno û verê garanî şano ko. Şino, dewaran çerêneno. Beno nîzde hele (nîmerocî) go 'Elik dewaran ver bi keye kero, hanêno hebêke çûçike hani ya serê leme de. 'Elik hêdî şino, destê xu nano ser û qefelêno, keno cêbê xu. Dewaranê xu ver bi keye keno, ano hel.

Dewarî resenê miyanê dew, 'Elik yeno pey vahî (vayî) û vindeno. Vano:

-Rihê, Rihê, min rê kardî biya!

Rihe kêf kena, vana "qey 'Elikî seyda ma rê çike ardo, ma go ser nin, go tûfî te de kêf bikerê". Leze kena, cor de yena war. 'Elik destê xu keno cêbê xu, çûçike veceno û miyanê destê xu de şedêneno. Rihe vana:

-'Elik, ena çi ya?

'Elik vano: -Rihê, to ra neyena malneketî? Ma go xu rê sere birnin, sere w pay cay rocêke borin, vêre û sincûqanê cay zî rocêke borin. Ma go goştê cay zî xu rê quwarne (qawurme) kerin. A vana: -'Elik, veşanî dawo serey to ro? Ena verê qefêkey dindanê to rê nêvecena. Vera wa şoro, guna wa.

Çûçe hawnêna fikrê 'Elikî xirab o, go ay sere bibirno, vana:

-Ya Rebî, ti zawan fekê min finê, ez xu rê enî îsanî dir xeberî bidî!

Homa ziwan fineno fekê cay, vana:

'Elik, ti min vera de. Kê min hanîk o Qulê Qerquşî de. Eger ti kewû tênganî, bêre (3) min hete. Ti binê 'erşê Homay de çi biwazê ez o bidî to.

'Elik hawnêno xu ra, hawnêna çûçike ra, heşe kona serey cê û Homa rehme fineno qelbê cê; gêno çûçike vera dano.

Rocêke, di rocî, hîrê rocî, tûfî veşanê. Nanê gawanî qîm nêkeno, vanê:

-Babo, nan!

'Elik hawnêno se kero, 'erdo wişk, ezmano berz. Nişka ver a kono vîrê cê, vana "A çûçike ana va, hela vinde ez hetê cay wa şinî".

Serê sibay wirzeno we, çaway xu gêno, dewaranê xu şano vernî xu û verê xu şano Qulê Qerquşî.

Şino, şino, hawnêno colêke pes eyseno. Şino reseno nîzde pesî, hawnêno şiwaneyke hani yo verê pesî de serê sîy wa nişto ro û bilûrê (4) xu lûrmeno. Vano:

-Şiwane, ti şiwaney kamî yê?

Ew (5) vano: -Ez şiwaney çûç a.

Çimê 'Elikî benê roşnî, kêfê cê yeno, vano "welle rast a". Perseno vano:

-Kê çûçe ça wo?

Şiwane vano: -Hani yo tiya ra wet.

'Elik henî zî şino, hawnêno naxirêke gay û gamêşî hani yê çerenê û gawanî zî hani yê ver de. Vano:

-Gawanîno! Şima gawanê kamî yê?

Ê vanê: -Ma gawanê çûçe y.

Vano: -Gelo kê çûçe ça beno?

Ê vanê: -Hani yo tiya ra wet.

Henî zî şino, hawnêno di hebî nobedaran fekê Qulê Qerquşî de nobete girota. Vano:

-Şima nobedarê kamî yê?

Ê vanê: -Ma nobedarê çûçe y. Ti kamê?

Ew vano: -Ez meymanê çûç a. Sorê çûçe ra vacê " 'Elik hamew".

Şinê çûçe ra vanê: -'Elik hamew.

Çûçe vana: -Leze biyarê zere.

'Elik gava (6) şino zere, hawnêno çûçe serê textê zerrîni de ništa ro û qerwaşî der û dorê ca yê, ci rê bawêşîne kenê.

Çûçe vana: -'Elik, ti bî xêr hamey, ti sere w çimanê min ser a hamey.

Û 'Elikî dana rûniştîşî, vana:

-Leze kerê, 'Elikî rê miyanroc (7) biyarê!

'Elikî rê miyanroc nanê ro. 'Elik hawnêno serê sêni de çi çinyo! Goştê kergan ciya, ê şamikan (8) ciya, birinc ciya, xuşab (9) ciya. Yanê ti çi Homay ra biwazê, serê sêni de esto. 'Elik weno, kalekan şedêneno hema heşe kona serey cê, tûfî konê vîrê cê. Veşanî û perîşanî tûtan ra bermayîş kono qirikê cê, hîsrê (10) 'Elikî cor de yê war.

Çûçe vana: -'Elik, çi rê zerrê to biya tenge?

Ew vano: -Min miyanroc werd, la tûtê min bî di rocî yo keye de veşanê. A vana: -'Elik, kederê tûtan meke.

Û ven dena qerwaşan, vana:

-Sêni û qamçî biyarê!

Anê, sêni û qamçî dana 'Elikî, vana:

-Ena sêni û qamçî bere, la memocne joy. Kînga (11) şima bî veşanî, qamçî xu sêni ro dê, vacê "fêki (12) û tehm!" go serê sêni şima pîrr bo. Borê, kalekan bişedênê û sêni xu wedarê.

'Elikê to sêni û qamçî gêno û verê xu şano keye. Yeno binê kaşî, ven deno vano:

-Rihê, Rihê, tûtan kom bike!

Kêfê Rihe yeno, vana "hela 'Elikî ma rê çi ardo?" Gava hawnêna 'Elikî sêni arda, vana:

-'Elik, to sêni arda? Min va qey ti go tûtan rê nan-manêke biyarê.

Vano: -Rihê, malneketî, tûtan kom ke!

Tûtan kom kenê, benê diyar, sêni miyanê xu de nanê ro û 'Elik qamçî xu dano pero, vano:

-Fêki û tehm!

Binê 'erşê Homay de çi esto yeno serê sêni. Tûfî wenê, kalekan şedênênê, benê mestî.

Ewca ra tepiya hendî hergû roc kar û halê 'Elikî, Rihe û tûtan anakî berdewam beno. Roc bi roc tûfî yenê xu ser, sûr û kurrî (13) benê. Rocêke 'Elik awdane (14) keno, hawnêno axayê dew ewca ra vêreno ra. 'Elik şino vernî axay, vana:

-Axa, bêre meymanî min.

Axa vano: -'Elik, 'Elik, ez axa wa, ti kamê ku ez bêri meymanê to? Ez bêri ti go çi bidê min? Ti go min serê pelasa mûyine de bidê rûniştîşî?

'Elik vano: -Axa, hela ti bêre.

Axa zî vano "ez şinî hela 'Eliko feqîr mi ra vano çî?" Şino kê 'Elikî, 'Elik vazdano pey kuwarîyan, beno sêni ro ku biyaro, Rihe vana:

-'Elik, ti se kenê? Axa sêni bivîno go ma ra bigîro!

Kena nêkena 'Elik goş nêşano ci. Ku Rihe sêni destê 'Elikî de pê bigîro, 'Elik tehneke ver deno ro ci, ay weta erzeno; vano:

-Weta şo! Axa hamew kê ma meymanî, ti hema vana çî?

Û sêni xu beno verê axay de nano ro, qamçî dano pero, vano:

-Fêki û tehm!

Serê sêni beno pîrrî. Çike nêmaneno yeno serê sêni. Birinc, goştê zerencan, goştê kevokan (15), ê harêweş (16) û kezalan, ê kar (17) û berxan, ê teyr û tîlûran, fêki. Binê 'erşê Homay de ti çi biwazê yenê serê sêni.

Axa nanê xu weno, vano:

'Elik, ena sêni heqê to niya, heqê min a.

'Elik vano: -Axa, eg ti sêni berê, go tûfî se kerê, çi borê?

Axa vano: -Tûfî çi wenê wa borê! Sêni heqê min a!

Û sêni şano binê çengê xu, verê xu şano keye, şino.

Rihe vana: -'Elik, min to ra va "Ma kamê, axa kam o? Sêni memocne axay", to mote ci. To mote ci, ê zî berde. Enka ma go se kerin, go tûfî se kerê?

Ewca ra pey reyna tûfî veşan manenê. Dihîrê rocî miyan ra şinê, 'Elik vano "hela ez reyna hetê çûçe ra şinî, ka seyîno beno?"

Şino, çûçe vana: -'Elik, ti bî xêr hamey. Xêr a, se biyo?

'Elik vano: -Axay sêni mi ra girote.

Çûçe vana: -Hela 'Elikî rê mehîre (18) biyarê!

Mehîre anê, 'Elik mehîre weno, heşe yena serey cê. Çûçe vana:

-'Elik, hebêke herê min esto, zêrran keno. Ez o ê herî bidî to, bere keye, çarşebe (19) bin de rafine û şive (20) pero de, go zêrran bikero. La nêbo nêbo ti joy ra vacê! Heşe xu bike serey xu, ena reya peyîna!

'Elik herê xu ano, yeno reseno binê kaşî, ven deno vano:

-Rihê, Rihê!

Rihe cor de vazdena war, hawnêna herêke hani yo 'Elikî dir. Vana:

'Elik, eno çi her o, herê kamî yo?

Vano: -Rihê, vengê xu meke, min ma rê ardo.

Herê xu beno zere, çarşebe bin de fineno ra û şivê dano pero, vano:

-Hero, zêrran bike!

Her vano xuşş serê çarşebe keno pîrrî zêrran. Rihe vana:

'Elik, gidî, ti enî zî bider nêdê!

'Elik vano: -Nê nê.

'Elik û Rihe hergû ray benê xu rê çende hebî zêrran kenê werdî, pê çi gênê, reyna zî nêqedênê.

Rocêke 'Elik barêke genim bar keno û şino hareyey Kê Meh-mê Mûsî (21). Hawnêno hareye (22) de dorî zehfê, vano "welle ez o çengêke zêrran bidî Hemê Safe (23), go arrişê min vernî heminan bitehno. 'Elik şino teber, şiv dano herî ro, vano:

-Hero, çengêke zêrran bike!

Her çengêke zêrran keno. 'Elik zêrranê xu gêno, keno cêbê xu; la Husê Xecike wo Qiramekîc (24) serê tehtë limacî de limac keno, vînenno ku herê 'Elikî zêrrî kerdî.

'Elik şino zerey hareyî, harêwanî (25) fer keno (26), vano:

-Ti arrişê min vernî heminan bitehnî, ez o çengêke zêrran bidî to.

Hemê Safe wo harêwan vano:

-De vindire wa Hecî Yemlîxa (27) şoro sihêfî Rezê Qoqanî (28), wa ew şoro, ez o arrişê to pero

FERHENGEKÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ-II

Malmîsanîj

Table with 3 columns: Kirdki (Zazaki), Pehlewki, Kurmanci. Lists various words and their equivalents in the three dialects.

*Kelmeyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Ferveşî, Ferhengê Pehlevî. ***Palişnaxaz [balişngaz], Pehlewki di yena me'na nivîni (livîni).

kerî. La eger Hecî Yemlîxa pê bihesyo min bi bertil arrişê to vernî ê binan tehnawo, go ew min verê hareyî ra biqewerno.

Hecî Yemlîxa vano: -Hemo, ez hani ya şina Dehlê 'Elo Gurî (29), ewca ra zî ez şina sihêfî Rezê Qoqanî. Ti arrişanê şarî rind bitehnê ha!

Ew şino, Hem dorê 'Elikî keno vernî, arrişê ci keno pero, tehreno.

Ê zerre de arrişê tehnenê, Husê Xecike yeno şive dano herî ro, vano:

-Hero, çengêke zêrran bike!

Her çengêke zêrran keno. Hus zêrranê xo cêbê xo, cilê herê xu dano herê 'Elikî ra û cilê herê 'Elikî zî dano herê xu ra. Herê 'Elikî ano cayê herê xu de girê dano, herê xu zî beno cayê herê 'Elikî de girê dano. Zêrrêke zî keno qinê herê 'Elikî û nîmeykey cê teber a verdano.

Arrişê 'Elikî yeno war. 'Elik barê xu derzeno, çengêke zêrran zî dano Hemî û yeno teber ku herî bero. Hawnêno hebêke zêrr hani yo qinê herî ro hamewo teber. Leze gêno, keno cêbê xu, vano

"wa jo nêvîno". Herî ano verê barî, barê xu bar keno, şedêneno û kono rahî. La hayî cê tera çinya ku Husê Xecike herê xu û herê ê bedel-nay.

'Elik yeno keye. Barê xu qeleb-neno, beno diyar.

A şewî maneno, ew serê sibay-yêr ano çarşebe fineno ra, şive dano pero, vano:

-Hero, zêrran bike!

Keno nêkeno her zêrran nêke-no. Vano:

-Gelo se bî?

Boyke vîndenê, hende vînenê herî sil kerd serê çarşebe. Hendî zanê ku her destê inan ra şî.

Çendeyke miyan ra vêreno ra, reyna tûfî veşan manenê. 'Elik vano "hela ez reyna hetê çûçe wa şinî, a nêbo halê ma perîşan o". Kono rahî û şino reseno kê çûçe. Çûçe vana:

'Elik, xêr a? Ena rey se bî?

'Elik vano: -Wele her zî şî.

Çûçe vana: -'Elikî rê nanêke nan û tasêke aw biyarê!

Anê nanêke nan û tasêke aw ver de nanê ro. 'Elik nan û awê xu

Dûmahîka Nivîsan

Peyvên şêrîn rastiya GAP'ê venaşêrin

bikeve, li deverê avahî û binkeyên bikaranîne nehatine danîn. Û daxwaz ew e ku elektrîk bo aliyê Tirkiyê bê veguhastin.

Ji bilî polîtîkaya resmî û sersariyê, mirov dikare bibêjê ku derba herî giran bi vê projeyê li esêrên dîrokî û kulturî yê Kurdîstanê dikeve. Ji xwe ji berê de Tirkiyê ji parastina wan xwe dida paş, her tiştê dîrokî, yan kulturî bi Kurd û Kurdîstanê ve girêdayî be, ji bo nehêlana wê dixebitî. Bi vê projeyê jî çend kaviyên bajarên antik yê Kurdîstanê di bin ava "Bendava Karakaya" de man û ji bo xilaskirina wan tiştek nehatiye kirin, bajarê antik Samat di bin ava "Bendava Ataturk"

de ma û ihtimaleke pir mezin wê bajarê Hesenkeyf jî di bin ava "Bendava Ilisu" de bimîne.

Dewleta Tirkî di dema avakirina vê projeyê de xuya kir çiqas "qîmet" dide Kurdan. Erdê xelkê deverê yê ku diket ber vê projeyê bi buhayekî pir erzan hat kirin û perê wan heta nuha jî nehatiye dan.

Her weha bajarên ku dikevin ber vê projeyê jî aliyê avahiyên bingehî de nikarin xwe li ber encamên vê projeyê bogrin. Li dijî qirêjiya avê, hewayê, ya ji endustrî û derxistina madenên bînerdî dizên tu tedbîr nehatine standin û xelkê deverê û raya giştî bi zanîna ji van probleman nayên

agahdar kirin.

Giregirên Tirkiyê di hemû beyan û gotinên xwe de dibêjin ku bi vê projeyê emê rûyê deverê biguherînin, wê dever bi pêş bikeve û h.w.. Lê ji ber sedemên li jor hatin gotin, bi giştî mirov dikare bibêje; ji bona ku PAB wek projeya entegre bigihe armanca xwe û feydeyekê bide xelkê deverê, divê berî her tiştî di pîrsa Kurd û Kurdîstanê de rê ji bo çareyên demokratîk bê vekirin, gelê Kurd li ser projeyên devera xwe, xwe bi xwe bibe xwedî bîryar, rê bê vekirin ku bi aktîfî beşdarî projeyan bibe û erd bi edaletî bê belav kirin.

Rewşa problema Kurdî...

Bi Kurtî neticeyên ku ji sempozîyûmê derketin ev in:

- Hate diyarkirin ku, pîrsa Kurdî dikeve kultura polîtîka navnetewî û dibe problêma yekem li rojhilata navîn, ku zu yan dereng, gerek çare jê re bête dîtin.

- Ji bo bîdestxistina statuyêke navnetewî pêwîst e Kurd dezgeheke xwe ya yekbûyê çêkin, ku nûneriya pîrsa netewî di warê dîplomasiyê û yê din de bike.

- Pêwîstiya piştigirî, parastin û

pêşvebirina destxistinên Kurdîstanê başûr heta diyarkirin.

- Rexne li şêweyên xebata Kurdnasiyê berî niha hatekirin ku, nikaribû realîtet û rastî ya hebûn, dîrok û daxwazên gelê Kurd bi hawakî lazîm deyne ber çavan.

- Çend bîryar, li ser rohniya meteryalên simpozîyûmê hatin wergirtin. Gerek raporek here dîwana serokê Rusya yê. Xebata "grupa lêkolînên Kurdî" berfirehtir û hêztir bibe. Bîryara înzekirina

protokola hevkarî yê li instîtuya Kurdî ya li Berlînê re hate girtin.

-Sala pêş, 1995 simpozîyûmeke din tê danîn.

-Programa simpozîyûmê ev bû: Bi firehî liser rewşa gelê Kurd û berxwedana wî li Kurdîstana bakûr hate axivtin û hate diyarkirin ku, zu yan dereng dewleta Tirkiyê mecbûrî çareyekê aşîti dibe û Kurd wê mafên xwe bistîne.

'Elik û Çûçe

weno, çûçe vana:

-Biyarê mîrkut bidê 'Elikî!

Anê mîrkut danê 'Elikî. Çûçe vana:

-Eno çî min o herî peyin o. Hendî çîkey min nêmend. Eger ti enî zî bider bidî hendî hetê min wa meye. Enî mîrkutî bere kê axay. Seyîn ti kewî miyanê beryay, vacê "mîrkut û dankut!" Go mîrkut berz bo û bigino serey înan ro. Go ê eman bekerê vacê "Ti çî wazenê?" Ti vacê "Sênî min!" Ti go sênî xu înan ra bigirê û berê keye. Ba'dê şo kê Husê Xecike ê Qiramekî. Şo miyanê beryay û vacê "mîrkut û dankut!" Go mîrkut şoro binê banî û bigino miyanê serey înan ro. Go vacê "Ti çî wazenê, zey to!" Ti vacê "Herê min biyarê!" Ti go herê xu zî înan ra bigirê û berê keye.

'Elik mîrkutê xu gêno, şino kê axay, kono miyanê beryay, vano:

-Mîrkut û dankut!

Mîrkut gineno binê banî ro û gineno serey înan ro. Vanê:

-Eman! Ti çî wazenê?

Vano: -Sênî min biyarê!

Axa vano: -Leze kerê, sênî cê

biyarê!

Sênî cê anê, 'Elik sênî xu gêno, ano keye de nano ro û verê xu şano miyanê Qiramekan. Şino kono miyanê beryay, vano:

-Mîrkut û dankut!

Mîrkut beno berz û gineno miyanê serey înan ro. Vanê:

-Eman, yeman! Ti dehway çî kenê?

'Elik vano: -Herê min biyarê! Herê 'Elikî danê ci, 'Elik verê xu şano keye.

Ewca ra tepiya hendî kêf beno kêfê 'Elikî û Rihe.

(1)Min na fistanike Licoki di eşnawita (Licoki dewêka Licê ya).

(2)Rihe: Namê cenî yo. Rehîma.

(3)bêre: bê

(4)bilûre: lulî, zel

(5)ew: o, we

(6)gav: game

(7)miyanroc: werdê (werê)

ortey rojî

(8)şamike: 'el'elo

(9)xuşab: xoşaw

(10)hisrî: hesrî (hesrê çiman)

(11)kinga: key ke, gama ke

(12)fêkî: meywe

(13)sûr û kurr: qelew, xuam-eye

(14)awdane: karê awdayişî (awdayişê hêgay)

(15)kevoke: borani

(16)harêweş: hargûş, arûş, arwêş

(17)kar: keyri

(18)mehîre: germa duyeni, germa doyini

(19)çarşebe: çarşefî

(20)şive: şewti, şeyti

(21)Mehmê Mûsi: Camêrdêko Licokic o.

(22)hareye: arê, ayre

(23)Hemê Safe: Camêrdêko Licokic o.

(24)Qirameki: Mezra dewa Benê ya (Benê dewêka Licê ya).

(25)harêwan: arbançî, arwançî

(26)fer: tena, yew, jo, fert

(27)Heci Yemlixa: Camêrdêko Licokic o.

(28)Qoqan: Nizdî dewa Kerwesî da cayêk o.

(29)Dehlê 'Elo Guri: Miyanterê (beyntarê) dewanê Licok û Kerwesî di yo.

Medet Serhat hat...

dibêjin "jin", ne "jinok", dîya Medet jî jinekê jî "jin"an bû.

Medet piştî xwendina Ixdîrê lîseyê li Trabzonê xwend. Wê çaxê li Qersê û Erzîrûmê tenê lîse hebûn. Piştî lîseyê Medet hat li Stenbolê dest bi Fakulteya Huqûqê kir. Di nav hevalên xwe de di demek kurt de xwe da naskirin û heskirinê. Gelek hevalên wî jî hemû milletan hebûn, lê piarnî Kurd bûn. Kurdî baş diaxivî. Bi dengê xwe, bi bejn û bala xwe bi rabûn û rûniştina xwe tesîreke baş û mezin li ser hemû kesan dihîşt. Tê digot qey Medet jî salên xwe mezintir e. Bawerîyeke mezin dida derûdora xwe.

Ez di salên 1958-59'an de li Stenbolê bûm. Min eskeriya xwe wek doktor li Stenbolê dikir. Medet û hevalên wî xwendevan bûn. Ew, Sait Kirmizitoprak, Ali Yaşar, Ziya Acar, Fevzî Avşar û gelekên din, du rojan careke dihatin mala min. Min Celal Yeltekin û Halis Yokuş bi hev re daîreyek kirê kiribû, Celal û Halis jî ji hêla Qersê bûn.

Di sala 1959'an de 102 xwendevanên Unîwersîteya Stenbolê telgerafek ji Mebûsê Nixdeyê Asim Eren re şandin. Di ciyê telgirafşandina wan de "Xortên Kurd" nivîsibûn. Ev telgiraf tu bêjî qiyamet rakir. Kesên ku felgiraf şandibûn yek ji wan Medet bû. Di van rojên nêzik de kitêbek, bi navê "Dosya 49'an" yê li Tirkiyê çap bibe. Min ev bûyer di wê derê de çapkirine.

Di dawiya sala 1959'an de Medet bi 39 Kurdên din ve hatin girtin. Di hepsa eskeriyê li Orhaniyê di hucran de diman. Ez jî di nav wan de bûm.

Min di jiyana xwe de yekî mîna Medet ku bi hêsayî têkilî bi insanen re deyne nedît. Psikolojî û rewşa yê hemberî xwe baş dizanibû. Eskerên gardiyan pir zû bûn dostê wî. Şevêkê min dît ku eskerekî deriyê huca min vekir û xwarin da min û got; "birayê te ji te re ev xwarin şand". Min jê pirsî; "ka birayê min di kîjan hucreyê de ye?". Wî piştî ku ji min re got, ez têgihîştim ku "birayê min" Medet e. Ji esker re gotibû, em birayê hev yê dayik in, bavê me ne yek e, ji bo wê paşnavê me cûda ye".

Medet pîrr jîr bû, tîrs li ba wî tunebû, lê wek kesên bêhesab xwe ne dida pêş. Bi aqil û zanebûn nêzikî meselan dibû.

Piştî ku ji girîxanê derket, ew û çend hevalên wî -Yaşar Kaya, Ergun Koyuncu û Celal Ergunkovara "Deng" derxistin. Ev kovar 4 jimar derket û paşê hat qedexekirin û heval jî hatin girtin. Di hejmarê yekemîn de, di

bin navê "çıkarken" bi Tirkî armanca derketina kovarê hatiye nivîsandin. Di nivîsê de "Rojhilat şîma paş ve maye, çî çare pewîst in" hatiye nivîsandin, dijî qedexekirina Kurdî tete rawestandî. Hinek nivîs û helbestên Kurdî jî hatine çapkirin. Wek şîrîrên Faik Bucak û Kemal Badillî yê mebûsê Ruha yê.

Di Hezîrana 1963'an de Medet û 22 Kurdên din hatin girtin. Hinek ji wan xwendevanên Kurdên Îran û Iraqê bûn. Di derheqa wan kesan de dadgeh dîtina xwe dinivîse û ji bo Medet wiha dinivîse; "Komunîstê Kurdperwer e û kovareke bi navê DENG derxistiye".

Piştî van bûyeran derd û kulên Medet hîn jî dom dikir. Ji mahkema 49'an ceza girt û surgun bû, paşê wî şandin Sêwasê eskeriyê û kirin eskerê bê rutbe.

Piştê Medet dest bi abûqatiyê kir. Li Stenbolê û Ixdîrê bi nav û deng bû. Her roj pê de pê de di hemû Rojilat û Rojhilata Başûrê Anadoluyê -Kurdîstanê- de hat naskirin û di nav gel de bi qedr û qîmet bû.

Medet alîkariya hemû Kurdan dikir, ferq nedikir navbera wan. Di nav Tirkan de jî gelek dostên wî hebûn. Pîrr kesan bawerî pê dianînin.

Berî ku cuneya faşîst ya 12'ê Îlonê bê, Komeleya Aştîyê hatibû avakirin, Medet yek ji wan hîmdaran bû. Qerara girtina wî derket, lê Medet wê demê çû Îngilîstanê, qedera 6 mehan li wê derê ma. Wexta vegeriya Stenbolê qerara hepsê li ser wî rabû.

Bi hevalên xwe re bi navê "Weqfa Maf û azadiyên Kurd" waqfek avakirin. Dîsa bi hîmdarê "Weqfa Lêkolînên Huqûqa Civakî".

Medet pîrr jîr, Kurdekî welatperêz û bi aqil bû. Pir bi tolerans bû.

Ew bi zanetî hate kuştin. Yê ku ew kuştin di nav tariyê û reşayê de ne. Hukmumet heta ku qatilan nebîne yê di bin şikê de bimîne. Lê wisa tê xuyankirin ku serokwezîr û yê berpirsiyar van noqteyan nayîn bîra xwe.

Zanakî Kurd, Kurdekî bi qedir û qîmet dikujin û paşê, "abûqatê mafyayê, abûqatê Behcet Canturk hat kuştin" dibêjin. Ev gotin bi xwe ne di cî de ye û eybeke mezin e, abûqatî karek e ku meriv herkesî diparêze. Çima navên dawayên wî yê din nabêjin. Medet abûqatê DEP'ê û bêhejmar ciwanên ku di hefsan de jî dikir.

Yên ku Medet nasnekin û pê re hevalî nekirin nikarin, nikarin dilxemiya min fêm bikin. Sersaxî ji bo malbata Medet û gelê Kurd.

Leyla Zana Xelata Rafto wergirt

Xelata Weqfa Mafê Mirovî a Thorolf Rafto a 1994'an parlametara DEP'ê Leyla Zana wergirt. Ji ber ku L. Zana di hefsê de ye Serokê Enstîtû ya Kurd li Fransayê Kendal Nezan û Şivan Perwer beşdarî sempozîyoma xilata bûn. Bi vê munasebetê li Norwêçê li bajarê Bergenê di 2-4 ê Çirya Paşin de hefteya Kurdîstanê çê bû. Di 2'ê Çirya Paşin de filmê "Rê" rejîsorê Kurd Yilmaz Güney hat nîşandan û şeva Kurdîstanê çêbû. Şivan beşdarî şevê bû û xwarin û folklorê Kurdî hat pêşkêşkirin. Di 4'ê mehê de bi navê Kurd - gelê bê sinor semînerêke ji aliyê sekreterê dewletê yê Norwêçê Jan Egeland hat dayîn. Bi munasebeta dayîna xelata Rafto bo L. Zana, Weqfa Rafta broşoreke çap kir. Di broşorê de li ser xebat û jiyana L. Zana tete rawestandî û li ser dîroka Kurd û Kurdîstanê agahdarî tete dayîn. Wewfa Rafto herhewa afîşeke jî derxist.

Profesor Thorolf Rafto di 4.11.1994'an de wefat kiriyê û li ser navê wî waqfek ava bûye û ev 8 sal in li ser navê wî xelat belav dibe. Rafto wek profesor êli ser mafê insanî xebat û lêkolîn kiriyê.

Kultur, asîmîlasyon û rola...

bê hejandin û tevliheviya civaka kurd. Her wisa zimanê biyanî bi xwe re kultura neteweya serdest jî dihêne. Û dibe sebebê lawazî û paşdehiştina ziman û kultura gelê bîndest. Herweha ziman bi xwe re dîrok, edebiyat, siyaset, xwenasîna millî û gelek têkiliyên civakî yê gelê serdest dihêne. Ango asîmîlasyon ne tenê di çarçoveya zimanî de ye. Her weha helandin û tunekirina kultur û xwenasîna millî ya gelê(bîndest) tûşî van aloziyan e. Ji ber vê yekê yek ji karên pêşî yê dewleta CT-yê girtina medreseyên ku dervê prosesa asîmîlasyonê diman bû. Ango ew dezgehên ku lê bi zimanê kurdî perwerdekirin dihate pê û

bingehê kultur, ziman û rewşenbîriya civata Kurdîstanê bûn. Bi wan metodên xwe yê qirêj dewleta Tirk xwest û hewl da ku bi carekê gelê kurd ji tarîxa wî bi dîr biêxîne. Gelê kurd bê tarîx, bê zanîn, bê xwenasîna millî û bê kultureke nivîsî bihêle. Civata kurd tar û mar bike. Bi her awayî talan bike, xira bike. Parçeyêke ji kultura neteweyî, cil û bergên neteweyî ji meydanê rake. Bi kurtî kurdan ji rehên xwe yê netewî kokbir bike.

Çi mixabin dewleta tirk ya kemalist bi vê polîtîkaya xwe ya qirêj, li bakûrê Kurdîstanê gelekî rê birfye. Siyaseta asîmîlasyonê, ji ber qedexekirina zimanê kurdî,

girtina medreseyên kurdî, qedexekirina cil û bergên neteweyî, angû bi ser û bin kirina civata kurd, gelek tiştên me yê netewî ji me durxistiye.

Xwedîlêderketina zimanê kurdî û kultura neteweyî, li hember polîtîkaya dewletê ya asîmîlasyonê karekî giring e. Bi zimanê zikmakî-neteweyî-, bi dem û dezgehên weşanê (radyo, telwîzyon, perwerdekirina bi zimanê kurdî, kovar, rojname û hwd) polîtîkaya asîmîlasyonê dikare bê şikêndin û rê li ber yekîtiya milletê kurd vebe û xwenasîna millî kamil bibe.

Kultur û Polîtîka

Riza Polat

Ji bo wî pîvana rastiyê tunebû

Popper di meha Ilonê de li Londrayê ji nexweşiya kanserê mir û nikaribû paradigmataya ku hemû mirov bi mirin in, çewt derxîne

Karl Raimund Popper li Viyenê ji dayik bû. Ew li malekê bi kitêp dagirtî û bi diyek û bavekî entelektuel mezin bû. Popper gelek caran gotiye, ewî hê ji biçûkiya xwe ji wan kitêpa îstifade kirîye û nivîskara ku li wî pir tesîr kiriye Selma Lagerlof a Swêdî ye.

Jiyanek wek jiyana Popper dagirtî û bi berhem di cîhana fikrî de pir kêr e. Munaqeseyên ku Popper vekirine di hêla fikrî de tiştên pir cûda ne û jiyana wî ya entelektuelî pir alî bû. Wî dest avêt her babetê felsefê, gelek kitêb û meqalên vekirî bi zimanekî hêsa di derheqê dîroka felsefê, teoriya ilmî, felsefa civatê û siyaseta û metodên ilmî nivîsîne.

Popper ji bo civateke vekirî û zelal kitêbeke gelek giranbûha a ku bi navê "civaka vekirî û dijminên wê" (Open society and its Enemies) nivîsand. Pirsra girîng ji bo wî ew bû: Di hêla siyasî de dê kî karbidest be? Dê dezgeh çawa xwe ji bin tesîra karbidestên xerab xelas bikin yan jî dê tesîra wan çawan kêr bikin? Popper Ji bo civateke liberal, demokratîk û vekirî xebitî û ew di jiyana xwe de hertim li dijî rejimên totolîter û otorîter bû.

Popper wek sosyologekî têtê naskirin lê munaqeseyên ku wî di felsefê de vekirîye ji bi cîhana fikrî tiştên gelek nû û hîpotezên gelek cûda bûn. Ji bo wê jî ez difikirim di vê kurtemeqala xwe de tenê li ser nêrînên Popper, yên di derbareyê felsefê, fikrên wî yên ku mirov dikare bêje dewlemendkirin yan jî zêdekirina di fikrandina felsefê de yebisekinim.

Li gor felsefa Popper, di jiyandê de "Rastiyên ebedî û bêdawî tune", di jiyandê de ciyê dîtin yan jî destxistinên rastiyên mutlaq di felsefa wî de tune bû. Li gor wî heta şaştiya tişteki dernekeve, tespîten ber bi aqil yan jî nêrîn û tespîten nêzikî rastiyê hene.

Popper jî wê fikra xwe hereket dikir û digot ku: "teoriya ku di her hadîsê de rast derkeve di vê teoriyê de qûsûrek heye. Ew teoriya ku qet tu hadîseyekê de çewt dernekeve û di derheqê her tiştî de îzahata bide ew teoriya ji me re tişteki nabêje, ji ber wê jî ev teorî ne ilmî ye". Li gor ditîna wî Amprîkî bi naveroka xwe dikare pir xeletiyên wî jî hebin, lê dîsa jî ilmî ye. Ji teoriya Newton hereket dîke û dibêje, ji roja ku ew teorî ava bûye heta îro pir xeletî û kêmasiyên wê hatin dîtin lê dîsa ilmî ye.

Li gor wî ne rast e ilim ji bo rastiya teoriyekê bixebite. Pêwîst e mirov lê bigere ku xeletî û kema-

siyên teorîyekê û nêrinekê derxe holê. Ji bo wê jî dema teoriyek yan jî nêrinek ji kêmasî û xeletiyên, xwe bişo, hingê ber bi rastiyê ve diçe. Mirov dikare bêje felsefa wî esas li ser metoda ligerîna şaşderxistina teoriyên mewcût ava bûye.

Pir kesan ev metoda wî ya ku bi "aqilê rexnekir" hatiye naskirin wek zêdekirin yan jî alikariyêke nûh di ilmê civatê de hesibandine. Lê rastiyek jî heye ku mirov pêwîst e bîne zimên di qirnê XX'an de tu filozefekî qasî Popper ehemiyeta fikrî yan jî "aqilê rexnekir" di naveroka fikrê ilmî de neparastîye.

Di sîstema fikrandina wî de ciyê fantaziya û xeyala qet tune. Heta gihîştîye noqtekî wilo ku ji bo wî êdî ne pêwîst e mirov ji bo hîpotez û fantaziyên derbareyî rojên pêşî de bitêkoşe û yan jî xebat bike. Çûnkî di nêrînên Popper de yên di derheqê civatê de ciyê gavên piçûk piçûk hene, ew bawer dike ku anax bi gavên piçûk û hêdî mirov dikare ber bi rastiyê biçe. Heta ew nêrînan Popper bire noqtekî wisa ku alixwazên wî jî nikaribûn wî biparêzin. Nêrînên wî yên di derheqê teoriya Darwin, teoriya Marks ya di derheqê dîrokê û di derheqê teoriya Freud ya psîkanalîzîst pir ekstrem e, ji aliyê gelek alixwazên wî jî nehat parastin.

Mirov dikare bêje ku kêmasiya teoriya Popper a herî mezin ew bû ku dijderketina wî ya li dijî fantazî, fikrandin û teoriyên di derbarê rojên pêşî de bû. Çûnkî fonksiyona mêjûyê insan yek jî ew e ku fikrandina wê ya ji bo rojên pêşiyê ye. Ji bo jiyaneke çêtir û avakirina wê, ji roja ku merov çêbûye û heta îro her fikiriye û mirovayetiye ji bo jiyana rojên pêş herroj fantazî û teorî ava kirine.

Dem a mirov di vê çerçevê de felsefa Popper dinêre felsefa wî têra mêjû û entelektûeliya meriv nake. Ji bo wê sedemê jî felsefa Popper di vê hêlê de pir lawaz dimîne.

☆☆☆

Di konferansêkê de guhdarek ji Popper dipirse: "Tu dibêji pîvanek her dem ji bo rastiyê tune ye û tu dibêji heta berazek reş derneke, beraz hemû sipî ne". Lê tu ji bo "paradigmataya hemû mirov bi mirin in çî dibêji?" Bersiva wî ew bû ku "Qet nebe mirov dikare bi teorîk jî bifikire ku mirin tune ye". Lê Popper li Londrayê ji kanserê mir û nikarî paradigmataya ku hemû insan bi mirin in çewt derxîne

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Her babet belavok name mesaj program û destûrên hazir tîn firotin!

Name:
Nameyên evîne
Nameyên serxweşiyê
Nameyên eskera
Nameyên pîrozbahiyê
Nameyên ji bo Enstîtuyê

Mesaj:
Mesajên şevên Newrozê
Mesajên kongra
Mesajên polîtîburo
Mesajên licna merkezî
Mesajên bi slogan: 5 wereqe
Mesajên bi sipas û silav: 10 wereqe
Mesajên îsofîn: 100 wereqe
Mesajên hingivîn: 50 wereqe

Belavok:
Belavokên Newrozê
Belavokên 1'ê Gulanê

Belavokên li ser Rojhilatanavîn
Belavokên li ser kolonyalizmê

Fiyeta belavokan li gor navero-kê tê guhertin:

-Belavokên bi rexne: 12 wereqe
-Belavokên bê rexne: 6 wereqe
-Belavokên "Li Dunyê dîrim, Li Rojhilatanavîn Dîrim û Li Kurdistanê Dîrim": 20 wereqe
-Belavokên damezrandin û hilweşandina rêxistin û partîyan: 100 wereqe
-Program û destûr (fiyet li gor daxwaziya serxwebûn, federasyon û otonomiyê diguhere)
-Belavoka "ÇIMA VEQET-YAM": 25 Quriş.

Nimûneyek ji qalibên belavokên me:

NEWROZ PÎROZ BE! (1)

Her ku diçe Emperyalîzma Dunyê bi pêşevanîya Amerika û dewletên din yê emperyalîst girtir, hartir û çavsortir dibe.

Emperyalîzma sîstema kapîtalîzma monopolîsta herî bilind e. Xurt e, heta qirikê çekdar e, lê îro bi ro qelstir dibe û nuha jî di doşeka mirinê de ye.

Li Rojhilatanavîn tu tiştêk wekî berê nîne.

Her tiştê guhertin. Wilo bilez tê guhertin ku rojek wekî ya din, saetek wekî ya din, deqeyê wekî ya din nîne. Helbet sedemê wê jî emperyalîzma dunyê ye.

Wekî hûn jî dizanin divê hemû sinifên karker û gelên bindest û pêşverû û welatparêz û pêşketinxwaz û anfi-emperyalîst û anfi-faşîst û anfi-şovenîst hemû piştigirîya hev bikin û yek bin.

Yan na emperyalîzma her çiqas li ber sekratê be jî, zû bi zû namire. Ji ber ku wek her tiştê wê, sekrata wê jî dirêj e.

Li Latîn Amerika jî rewş kêr-zêde wekî li Rojhilatanavîn e.

Li Afganîstanê jî xwe hûn dizanin çî dibe. Li Hindûçînê her wisa. Li Afrîka Başûr dîsa wisa. Şerê Iran û Iraqê her dîsa wisa (2).

Îcar li Kurdistanê jî jî Meda û vir de çavsooran û weledên wan ên îroyîn û rejîmên wan tiştên nemayî bi serê me de anîn. Lê nikaribûne dengê me bibirin.

Kolonyalîzma li welatê me kefiye her derê, lewre divê herkesê wê yekê zanibe. Do çawa bû, îro jî wisa ye û dijminê me sibê jî me li hember xwe dibîne.

Li Kurdistanê îro pergala berhemîya niv-feodal, niv-kapîtalîst û niv-şerî hakim e. Pêwendiyên berhemîyê jî her wilo ne. Avahîya ser û bin divê jî bin ve bête serûbinkirin.

Û divê neyê jî bîr kirin ku têkoşîna birayên me yê Filistinî jî a me ye.

Xelasî nêz e. Emperyalîzma û xulamên wê yê kolonyalîst û hwd. li ber mirinê ne.

Bibelqite emperyalîzma!

Bibelqite faşîzma û zordestîya li ser jin û zarokan!

Bi jî NEWROZ! (3)

(4).....

(1)-Alternatîfên din:
Bi jî Newroz
Newroz hat
Newrozêk din jî hat
Newroz dîsa hat

Me Newroz pîroz kir
Me Newroz bi hev re pîroz kir
(2)-Navên welatan li gor daxwazan tîn guhertin, kêr û zêdekirin.
(3)-Sîlogan li gor daxwazê pir erzan tê dagirtin.
(4)-Navê rêxistinê jî alî xwedîyê belavokê ve tê dagirtin.

Adres: Erzûhal-Holding, Namenûs Belavokzade Xan, no: 99/z, Telf: 00- Derveyî Welat

Ev nivîsa jorîn di dewr û hella-hella ya sîstemên emperyalîst û sosyalîst de di kovara Mirkut, no: 3 (1987) de hatibû belavkirin. Herçendî naveroka belavokê piçekî li gor rewşa dunyê ya îroyîn nagunce jî, lê hema wek biranîneke jî dewrê me got emê dîsa çap bikin daku xwendevanên me yê ku wê demê 10-15 salî bûn ku nuha 20-25 salî ne bila bizanibin ku wextekê me çî dikir û çî nedikir.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

Xewn alîkariya fêrbûnê dike

Dem a mirov li laboratuwarên xewnê tevgera elektrîkî ya mējîyê dipêve, têtê dîtin ku her kesekî periyodên xwe yê xewnê hene. Xewn di navbera her saetek û niv de hemû şevê dom dike.

Her periyodeke xewnê 15-20 deqîqe ye û di navbera xewnan de tevgera mējîyê

mirov gelekî nizm e.

Di dema periyodên xewnê de mējî pir aktîf e. Ku mirov yekî/yekê ku di periyodeke xewnê de şiyar bike ew kes dikare bi rehetî behsa xewna xwe bike. Ji ber wê yekê ye ku lēkolîner jê pir bawer in ku mējî di dema periyodên xewnê de aktîftir in.

Herçiqas em her şev xewnên wekhev dirêj dibînin jî di biranînê de ferq heye. Wisa têtê xuyakirin ku hafîza me ya demdirêjî di dema xewnê de jî holê radibe, rola xwe naleyize. Ji ber wê yekê ye ku eger em di nîva xewnê de şiyar nebin, xewn nayê bîra me. Lê eger carna em xewnên xwe yê berê bi bîr bînin sedem ew e ku em di dema xewnê de jî bo demek kurt şiyar dibin û carin dikevin xewê.